Mînaka Zimanê Îşaretan ya Nîkaragua pir balkêş e. Ji bo afîrîna zimanên îşaretan bê famkirin, fikir dide me. Li gorî ku Pinker (1994) dibêje, 1980an li Nîkaraguayê dibistaneke kerr û lalan hat avakirin. Zarokên kerr û lal yê ji civakê dûr, anîn dibistanê. Li vê dibistanê zarokên kerr û lal, di nav xwe da zimanekî îşaretan ava kirin. Ev ziman di nav zarokan da bi awayekî xwezayî û tevlihev çê bû. “Sala 2009an dewlet mecbur ma ku vî zimanî wekî zimanekî xwedî zagon, zimanekî xwedî rêziman, zimanekî xwedî peyv, zimanekî fermî û zimanekî standart qebûl kir.” (WFD, 2025). Ev çîroka afîrîna Zimanê Îşaretan ya Nîkaragua nîşan dide ku zimanên îşaretan di nav civakên kerr û lal da bi awayeke xwezayî, ji ber xwe, ji ber pêdivîyên mirovan çêdibe. Belê tiştê diyarker civaka kerr û lalan e. Taybetmendiyên her civakê jî cuda ne. Ji ber ku her civak ango netew, ji aliyê çand, ziman, xweza, dîrok, hişmendî, pêdivî, aborî, rewşa peşketin û paşvemanê û hwd. ve ji hev cuda ne, zimanê ku biafirînin jî wê ji hev cuda be.

Zimanên ku ji bo famkirina wateyê, kanala dîtbarî bikar tînin, bi navê zimanê îşaretan tên binavkirin. Hem bi îşaretên bi destan (manuel) hem bi îşaretên ji xeynî destan (non-manuel) tên îfade kirin. “Zimanên îşaretan zimanên xwedî xezîneya bêjeyan û xwedî avaniya rêziman in.” (Sandler, 2006). Zimanên îşaretan ne gerdûnî (international) ne, lêbelê di navbera wan da pir lêcûnî hene.

Tevahiya zimannasan qebûl dikin ku hem ragihana axaftinî û hem ragihana îşaretan ragihanên xwezayî ne. Yanî her du jî razber in, pêvajoyeke demdirêj û tekamûleke bi plan derketine holê. Lê bila ev zimanên bêpeyv, bi zimanê laş (body language) ra neyên tevlihevkirin. Zimanê laş (body language) li gorî ku Fant, L. & Fant, B. B. (2008) şîrove dikin, hêmaneke bingeîn yê ASL ye. Ragihandin ne tenê bi rû çêdibe; bi serî, sermil, laş/gewde, ling û piyan jî çêdibe. Bi taybetî serî, dema pirsan bikin bi pêş, paş û herdu aliyên va dikarin bitewînin. Sermilan dikarin dawêşînin; laş dikarin bi pêş û paş va bitewînin yan jî bizîvirînin. Ji bo ragihandineke zelal, divê mirov hemû laş daxilî îşaretan bike. Mirov dikare zêde jî kêr jî bi kar bîne, lê çiqas zaf bi kar bînin ewqas baş e. Ji ber ku zimanê laş pir bi kontrol bi kar tînin, mirovên kerr bi giştî mirovên bi kêf û coş û enerjîk in.

Li ku derê civakên kerr û lalan hebin li wê derê zimanê îşaretan bi awayekî xwezayî û bikêrhatî çêbûye û bi pêş ketiye. Heya bûne bingeha çanda kerr û lalên mehelî. Piraniya mirovên Zimanê Îşaretan (ZÎ) bikar tînin, dema dibistanê ji hevalên xwe ZÎ hîn dibin. Zimanê îşaretan giştî ji aliyê mirovên kerr û mirovên guhگیران tê bikaranîn; lê mirovên lal, mirovên ku ji ber nexweşiyekê yan jî jiber astengiyekê (ev astengî dibe ku zikmakî be jî, paşîkê be jî) nikarin bi axivîn, zarokên kerr û lalan yên ne kerr û lal (children of deaf adults, CODA) jî bikar tînin. CODA kurtenavê "Zarokên Dê û Bavên Kerr" e û navê mirovan e ku ji hêla dê û bavên kerr ve hatine mezinkirin lê dibihisin. Ji ber ku ji temenê biçûk ve hem zimanê îşaretan hem jî zimanê axaftinê bi dest dixin, gelek CODAyan bi duzimanî tên binavkirin. Ji ber ku hem di civaka normal da ne hem jî bi saya dê û bavên xwe yî kerr û lal di civaka kerran da ne, xwedî her du çandê ne jî. Ev taybetmendî di navbera dê û bavên wan û cihana bihîstinê da wekî pirekê xizmet dikin û gelek CODA di malbatê da wek wergêr mezin dibin. Gelek

CODA jî vê rewşê ji aliyê profesyonel ve bi pêş ve dibin û berê xwe didin wergêriya zimanê destnîşanê.

Li ser rûyê dinyayê çend zimanê îşaretan heye nayê zanîn. Bi piranî zîmanê her dewletê heye, lê li hin dewletan ji yekê pirtir zimanê îşaretan hene. Di edîsyona Ethnologue ya 2015an da behsa 173 zimanan tê kirin. “Ji van zimanan hinek xwedî statûya zagonî ne, yên din ne xwedî tu mafî ne.” (Wheatley, 2010).

### 1.1.Cudahiya Zimanê Îşaretan Ji Pergalên Din Yên Ragihandinê

Zimanzan, zimanê îşaretan yên xwezayî ji wan sîstemên ziman ku ji zimanên îşaretan çêbûne (*manually coded languages*) û ji yên ku bûne bingeha zimanê îşaretan, yanî îşaretên malê (*home-sign*), îşaretên pitikan (*babysign*), îşaretên ku meymûn/ ene t hîn bûne, vediqetînin. Çend pergalên ragihandinê hene ku bi temamî ne xwediyê taybetmendîyên zimanê îşaretê ne, bi taybetî jî avahiya rêzimanî, lê di hin krîteran da dişibin zimanên îşaretan. Piraniya wan yan pêşengên zimanê îşaretê ne yan jî ji zimanên îşaretê hatine dariştin.

Ji bo zimanê axaftinê kodkirina destan (*Manually coded spoken languages*): Ev pergal bi gelemperî ji bo hînkirina zimanê axaftinê ji bo zarokên kerr dibin alîkar, pêş dikevin û ji xeynî perwerdehiyê nayên bikaranîn. “Dema mirovên kerr û yên dibihîsin têkiliyê datînin, sîstemên îşaretan yên nû diafirînin ku rêziman ji zimanê axaftinê tê girtin û îşaret jî ji zimanê îşaretan tê girtin.” (Spencer & Glover, 2015). Bi taybetî dema ku mirov di zimanê îşaretê da têkiliyeke yeke yek di navbera peyvên axaftinê û nîşaneyan de diafirîne, êdî ev zimanê îşaretan nabe zimanekî xwezayî, dibe di navbera zimanê îşaretan û zimanê axaftinê da amûreke veguhertina peyvên ya bi destan.

Bi zarokên ne kerr ra “Zimanê îşareta yê pitikan” (*babysign*): Pitik bi gelemperî zutir dest bi bikaranîna îşaretan dikin. Ev, dibe alîkar ku dê û bav li ser tiştên ku pitik dixwazin ji tevliheviya hiş xilas bikin. “Hin dê û bavên dibihîsin, zarokên xwe yên biçûk yên dibihîsin hînî îşaretan dikin. Ji ene t masûlkeyên di ene t pitikan de ji ene wan zûtir pêş dikevin, îşaret ji bo ragihandineke baştir wekî vebijêrkeke bikêrhatî tê dîtin.” (Dilevva, 2011). Bi piranî dema zarok dest bi axaftinê dike îşaretên terikandin, da ku zarok rêzimana zimanê îşaretê bi dest naxin. Ev, berevajiyê

zarokên dibihîsin yê dê û bavên kerr e, ku zimanê îşaretê wekî zarokên kerr yê dê û bavên kerr wekî zimanê pêşîn fêr dibin.

Îşaretên malê (home-sign): Pergalên îşaretê yê bêpîvan û negihîştî carinan dikarin êne t malbatekê da pêş ve biçin. Bo nimûne, dema ku dê û bavên êne zimanê îşaretê da zanîna wan tine be, zarokekî wan ê kerr hebe, heta ku zarok ji êne dê û bavan ve êne zextkirin zarok bi awayekî xwezayî pergala îşaretê dikare bi pêş bixe. Terma ku ji êne t zimanên biçûk tê bikaranîn îşareta malê ye. Nîşana malê ji ber nebûna navgîneke din a ragihandinê tê nîşandan. Zarok bêyî êne seranserê jiyana xwe da ji civakekê piştgirî û paşvegerê nestîne, ji bo hewcedariyên xwe bi cih bîne nîşanan diafirîne, an jî ji bo tevlikirina hevokên kurt rêzikên xwe yê rêzimanî jî diafirîne. Lê êne pergaleke bi vî rengî ji bo pêşketina derûnî ya zarokekî ne têrker e û nikare ti pîvanên ku zimanzanan ji bo zimanekî temam danîne, bi cih bîne. “Tu îşaretên malê wekî zimanekî temam nehatine qebûl kirin.” (Meadow, 2005).

Bikaranîna êne t prîmatan da: Ev pergal jî bi zimanê îşaretan ra pir tê tevlihevkirin. Ji êne t êne t ji pir aliyan va dişibîne însanan, lê êne dişibin. “Hewldanên zanyaran hene ku zimanê îşaretê bidin prîmatên ne mirov ên wek şempanze, goril û orangutan ji bo ku bi mirovan re têkiliyê deynin.” (Pika & Mitani, 2006). “Lê êne zimannas gelek caran dibêjin ku ev yek rê li ber zanîna zimanekî mirovan venake, êne îşaret/gotin in.” (Wallman, 1992).

## 1.2. Cihgirtina Zimanê Îşaretan Ya Di Mejî Da

Wekî ku me li jor jî gotibû dema ku zimanê axaftinê tê bikaranîn, di mejîyê însanan da hin herêm hişyar dibin û ova dibin; gava zimanê îşaretan tê bikaranîn jî heman herêmên mejîyê însanan ova dibin. “Xebatên li ser cihgirtina ziman ya di mejî da nîşan didin ku axaftin û xebatên rêziman bi giştî di nîvkada çepê a mejî da, xebatên dîtbarî jî bi giştî di nîvakada rastê a mejî da cih digirin.” (Sandler & Martin, 2006).


Her çend pêşveçûnên zarokan ji hev cuda bi jî hin zimannas, hin standardan diyar kirine. Li gorî Bellugi & Klima (2001), di zarokan da peyvên pêşîn û îşaretên pêşîn nêzî meha 12an da tên dîtin. Hem di zimanê îşaretan (*sign language*) da hem di zimanê

axaftinê (*spoken language*) da rêziman di navbera mehên 18-20an da tê dîtin, heta 3-3.5 salî jî didome. Li gorî Pallier (2007), wekî zimanê axaftinê di zimanê îşaretan da jî temenekî krîtîk heye, heta 5-6 salî zarok ku tu îşaretan ovan piştî vê serdemê hînbûna zimanê îşaretan zortir dibe.

Zimanê axaftinê û ZÎ jî pir aliyan va dişibine hev. “Zimanê axaftinê û ZÎ heman agahiyê radigihînin, lêbelê metoda Zîyan ya cihî-dîtbare (*visual spatial*) taybetmendiyên binyadî yê jî metoda gotinkî cudatir peyde dike. ZA çêkirina bi deng bi kar tîne; ZÎ destan, jora laş û rû bi kar tîne.” (MacSweeney û yd., 2008). “ZÎ xwedî avaniyeke tevlihev ya zimanî ye. Lêbelê li gorî ZA di her astan da, avaniya xwe pirtir bi têkiliyên cihî vediguhezîne.” (Bellugi û yd., 1989).

Di vê qadê da xebatên li ser ZÎ bi giştî li ser Zimanê Îşaretan Emerîkî (ASL) tên çêkirin. Li gorî şîroveya Benes & Blagoev (2007) di xebatên li ser cihgirtina ASL û zimanê axaftinê ya di mejî da û tespîtîkirina herêmên aktîvasyonê da, gava vîdyoya mirovekî ku bi ASL hevokan ava dike bi mirovekî kerr û lal dane temaşekirin, di her du nîvkadên mejî da ovan yon hatiye tespîtîkirin. Heman ovan yon di mêjiyê axêverên ASL yê nekerr û lal da jî hatiye dîtin. Aktîvasyona ova nîvkada çepê da hatiye dîtin, di *inferior frontal gyrus* (herêma Broca), *superior frontal gyrus* (herêma Wernicke) jî ovan xwe da dihevine) û *left prefrontal cortex* da hatiye tespîtîkirin. Di nîvkada rast da herêmên hevcot di heman peywîrê peve ova bûne. Di mirovên axêverên îngilîzî u ASL nizanin da, tu ovan yon nehatiye dîtin.

Wekî ova zanîn, di mejiyê mirovan da hin herêm bi ragihandinê ra eleqedar in. Dronkers û yd. (2007), jî bo herêma Broca dibêjin ku ev herêma mejî bi fonksiyonên çêkirina denga ra eleqedar e. Ji hinga ku Pierre Broca gotiye xerabûna fonksiyonên axaftinê yê du nexweşan bi vê herêmê ra eleqedar in, wisa tê qebûlîkirin. Ew nexweş jî ovan jî “*posterior inferior frontal gyrus*”ê birîndar bûbûn û piştî wê melekeya axaftinê wînda kiribûn, êdî ew herêm hate qebûlîkirin ku bi axaftinê ra têkildar e. Herêma Wernicke, bi navê “herêma axaftinê ya Wernicke” jî tê binavîkirin. Ji du herêmên *serebral cortex*ê ye ku bi axaftinê ra eleqedar in. Berovaciye Broca, bi famîkirina nivîs û axaftinê ra eleqedar e.



Şekil 1: Herêmên Axaftinê Yên Di Mejî Da

Teqez her herêma mejî bi taybetmendiyekê ra eleqedar e. “Herêma superior temporal area di pêvajoya hilberandina ZÎ da xwedî rol e, her wiha herêma posterior parietal area ku mexsûsê îşaretan e, di hilberandina ZÎ da ovan dibe. Aktîvasyona van herêman nîşan dide ku jest, mexsûsê fonksîyonên hesî-motor in.” (Emmorey û yd., 2007).

Di pêvajoya têgihiştina ziman da, tê dîtin ku “di ZA û ZÎ da lateralizasyona wekî hev heye.” (MacSweeney û yd., 2004). “Lêbelê di têgihiştina ZA û ZÎ da ji ova aktivasyona nîvqadên mejî da cudatî hene.” (Pa û yd., 2008). “Di xebateke din da hatiye dîtin ova nîvkada rastê ya mirovên kerr ku ZÎ bikar tînin da, ji mirovên nekerr ku ZÎ bikar tînin da pirtir aktivasyon çêdibe.” (Neville û yd., 1998).

Di xebata li ser mirovên duziman ku ASL û îngilîzî bi kar tînin, “di pêvajoya têgihiştina ZÎ da, di herêma occipito-temporal area, di herêma dualî ya posterior-superior temporal area, di herêma superior parietal cortex, di herêma posterior frontal region da ovan yon hatiye tespîtîkirin.” (Pa û yd. 2008). Di pêvajoya têgihiştina axaftinê da pirtir ovan yona herêmên posterior temporal lobe û posterior frontal region hatiye dîtin. Dema ku herêmên ovan yona her du zimanî hate berawirdîkirin, hatiye dîtin ku herêma posterior-superior temporal korteks û şaxa frontal wekî hev

derketin. Ji ber vê, axaftin, herêmên bihîstinê yên di şaxên posterior-superior û frontal lobeê ji îşaretan zaftir ovan dike; îşaret jî, şaxên dîtînî-grêdanî yên di herêma ventral oksîpîtotemporal da ji axaftinê zaftir ovan dike. “Ji xeynî vê ZÎ, ew herêmên posterior parietal ku ZA ovan nake û mekanîzmayên dîtînî-manuel hesî-motor şewq didin jî ovan dike.” (Hickok & Bellugi, 2010).

Zimanê îşaretan jî wekî ZA xwedî bingeha aqilî û zimanî ye. Lêbelê ZÎ zimanekî dîtînî-sêberî ye û ji ber vê bi herêmên cuda yên mejî va têkildar e.

Wateya van her du peyvên “kerr” û “Kerr” hê tam runeniştiye. Lê îro peyva “kerr” (deaf) ya bi tîpa hurdek ji bo mirovên ku pir hindik dibihîsin yan hîç nabihîsin, yan jî hesta xwe ya bihîstinê ji dest dane tê bikaranîn (ev jî cureyeke berastengiyê ye). Ev model modeleke tîbbî ye û dixwazin kerr û laliyê ji holê rakin. Peyva “Kerr” (Deaf) ya bi tîpa girdek jî ji bo wan mirovan tê bikaranîn ku kerr û laliyê mîna çandekê, mîna navnîşanekê qebûl dikin bi kar tînin û ev kes dixwazin diyar bikin ku bi taybetî bi zimanê îşaretan ragihandina xwe dikin. Mirovên ku ZÎ bi kar tînin û wê wek zimanê zikmakî qebûl dikin û di çalakiyên kerr û lalan da çalakin, bi peyva “Kerr”, civaka wan jî bi peyva “Civaka Kerr” tê binavkirin. Ji ovan kesan kerrbûn ne tişteki tîbbî ye, tişteki civakî û çandî ye. Ev model dixwaze ku nêrîna civakê ya neyînî çareser bike.

### 1.3.Morfolojî

Di zimanên îşaretan da îşaret hem bi destan (şiklê dest, ene dest, cih û livandin) hem ji xeynî destan (livandinên serî û laş, mehd û jestên dev) tên çêkirin. Wekî her zimanê xwezayî divê mirov fonemên herî piçûk ene . Ev jî dibîne ene ku cudabûna livandinên pir dişibîne hev nîşan bide.

Morfolojîya/çêkirina îşaretan dişibe morfolojîya Zîyên din. Wekî ku Johnston & Schembri (2010) diyar kirine, bi taybetî pîvanên bidestkî (*manual parameters*) wekî ene dest (*handshape*), cih (*location*) û hereket/livandin (*movement*) bi mijarê ra têkildar in. Hê jî teqez ne diyar e ku pîvanên wekî berîdana dest (*orientation of the hand*) û taybetmendiyên ne bidestkî (*non-manual features*), di diyarkirina îşaretan da pîvanên giring in yan ne giring in. Ne pir berbelavbûyî be jî di ZAKê da

taybetmendiye ne bidestkî (*non-manual features*) hatine tesdîqkirin. Ev şiklên dest hatine tesdîqkirin ku bingeha wê navnîşeke ji 275 hêmanên cuda pêkhatî ye.

Bi nêrîna Sutton-Spence & Woll (1999) di zimanên axaftinê da ji bo peyvên nû bîrîn deng/fonem tîrî cem hev. Di Zîyan da hêmanên binyadî yêr wekî “şiklê dest, cih, berîdan” tîrî cem hev. Zimanên axaftinê kanala dengî-bihîstinî bi kar tînin, Zî kanala dîtbarî bi kar tînin. Li gorî kanala ragihandinê di zimanê axaftinê da peyv bi lihevçivîna dengên dengdêr û dengdar hwd, di Zîyan da bi lihevçivîna şiklê dest, cih, livandina destan, berîdana kefa dest û tilîyan û îşaretên ji xeynî dest pêk tîr.

Di zimanê axaftinê da kompleksbûna ene an k ji çend aliyan va diguhere. Ji bo zimanê kurdî yê axaftinê, mînaka peyva Ferhengok (ferheng+ok), ji peyva ferheng û ji qertafa ok pêk tî. Çiqas qertaf zêde dibin, ewqas komplekstir dibe. Di Zîyan da peyv/îşaret ji pênc parametreyan (şiklê dest, cih, livandin, ene livandinê, taybetiyên ne bidestkî) pêk tî. Ji ber vê, di Zîyan da morfemên (*morpheme*) ji zimanê axaftinê cuda tîr dîtîr. Bo nîmûne, di ZAK da nîşandana îşaretên Heftê + Bê û Saet + 2 ji ber hejmar, ji ber dem û pêşîbûn-paşîbûnê ji îşaretên Pîsîk, Îro û Mêr ji ene ene an k va komplekstir in.



**Şekil 2: Di ZAK Da Îşareta Saet 2**

Îşareta Mêr ji ene ene an k ene qasî Saet 2 ne kompleks e.



**Şekil 3: Di ZAK Da Îşareta MÊR**

Mînaka îşareta *Pîsîk* jî ji ene hêmanên ene an k ene qasî îşareta *Saet 2* ne kompleks e.



**Şekil 4: Di ZAK Da Îşareta PÎSÎK**

Di îşareta *Saet +2* da şiklê dest hejmara 2 nîşan dide, îşareta ku tilî ber bi pêş va bikevane hereket dike saetê nîşan dide. Dema îşareta *Saet + 3* nîşan didin ene şiklê dest diguhere, 3 nîşan dide. Di Zîyan da guhertinên 5 parametreyan her yekî da, avahiya îşaretê ya ene an k diguherîne. Di îşaretên *Saet +2* û *Saet +3* da ene şiklê dest diguhere.



**Şekil 5: Di ZAK Da Îşareta MEHA BÊ**

Di îşaretên *Meh* + *Borî* û *Meh* + *Bê* da ene ene livandinê (*orientation*) diguhere. Ev jî nîşan dide ku ev îşaret xwedî morfemên cuda ne. Em dikarin mînakên zêde bikin.



**Şekil 6: Di ZAK Da Îşareta MEHA BORÎ**

Morfem, taybetî û fonksiyonên yekeyên herî piçûk nîşan dide û bi navê girêdayî û xweser du cure ne. Li gorî Bloomfield (1933) di lîteratûrê da morfem wekî “yekeya bi wate ya herî piçûk” tê pênasekirin.

Morfemên girêdayî (*bound morpheme*), yekeyên herî piçûkin ene ziman da bêtir peyveke din hebûna wan ne pêkane, yanî ji bo ene an da pêk bê divê tevî kokek yan gewdeyeke peyvekê bibe. Mînak, di zimanê kurdî da, di peyva Batmanî (Batman-î) da qertafa “-î” morfemeke girêdayî ye û wateya wê “mîrovê ji Batmanê” ye yanî bi peyva Batmanê va girêdayî ye. Ev qertaf ene an da bi ene ne xwedî wateye û pêk nayê.


Morfemên xweser (*free morpheme*), yekeyên ku pêdiviya wan bi peyveke din tine ye, yanî bi ene jî xwedî wate ne. Mînak, peyva Nexweşxane (Nexweş-xane) da,

yekeya “-Xane” xwedî wateya “cîh, şûn” e , xweser e, yanî ene an da bi ene jî dikare pêk bê.

Morfemên girêdayî, dema ene peyvekê hatin zêdekirin ku wateya peyvê biguherînin dibine morfemên dariştinê yên girêdayî (*derivational bound morpheme*). Ku wateya peyvê neguherînin, ene bi kêrî kêşana peyvê werin dibine morfemên kêşanê yên girêdayî (*inflectional bound morpheme*).

Morfemên xweser ku xwedî wateyeka peyvî bin bi terma morfemên ferhengî yên xweser (*lexical free morpheme*) tên binavkirin, mina “pirtûk, xwendin, delal”. Ku ne xwedî wateya peyvî bin lêbelê di navbera peyvan da têkiliyê pêk bînin bi terma morfemên rêzimanî yên xweser (*grammatical free morpheme*) tên binavkirin. Minak, daçek (di, li, ji, ve hwd.) û girêdek (û, ku, lew hwd.) ne xwedî wateya peyvî ne, lê di navbera peyvan da têkiliyên rêzimanî pêk tînin.

**Tablo 1: Tesnîfa Morfeman**




## 1.4. Fonolojî


### 1.3.1. Artîkulasyona fonetîkyê ya îşaretan

Çawa ku di artîkulasyona fonetîk ya peyvan da li ser hêmanên dîwanê dibin, ji bo artîkulasyona fonetîk ya îşaretan jî divê li ser hêmanên ku bi îşaretan va eleqedar in bisekinin. Li gorî Crasborn (2012) xebatên fonetîk, çekirin û têgihiştina îşaretên

bidestkî û nebidestkî dihundirîne. Ji bo zivirîna (*rotation*) zend, termên artîkulatîf wekî meyildar (*prone*) û serpiştê (*supine*) bi kar tîne. Serikê ku ji bo cîh û livandinê perçeyên fonolojîk yê giring çêdike, serikê dûr (*distal end*) e. Termên dûr (*distal*) û nêz (*proximal*), cîh îfade dikin ku ew jî xetên dest û mil in.



a) Perçeyên Laş û Movikan



b) Termên Cih



c) Rewşên Zivirîna Zend

### Şekil 7: Termînolojiya Ku Ji bo Pênasekirina Îşaretên Bidestkî Tê Bikaranîn

Di tesnîfa Crasborn (2012) da pir hêman hene. Emê niha perçeyên laş û movikan, termên cih û rewşên zivirîna zend rave bikin. *Shoulder*, sermil e û hem movik e hem dilive. *Elbow*, enîşk e û hem movik e hem dilive. Wekî ku li tabloya jor tê dîtîn *upper arm*, perçeyekî laş e ku navbera sermil û enîşkê ye, nemovik e û nalive. *Forearm*, zend e, nemovik e û nalive. *Wrist*, gozîk/bazend e, hem movik e hem dilive. *Finger joints*, movikên tiliyan in û dilivin. Ji bo termên cih, *ipsi-lateral*, berî bi destnîşanker va; *contra-lateral*, berî ji destnîşanker dûr va. *Proksimal*, nêz; *distal*, dûr e. Ji bo rewşa zend; *supine*, zend li jor ziviriye; *prone*, kefa li jêr ziviriye; *neutral*, zend di pozîsyona normal da ye.

Crasborn (2012) ji xeynê vê, şîroveyeke wisa jî dike ku dema artîkulasyona bidestkî ji aliyê movikên cuda pênase dike, ji sermil heta movikên serikê tiliyan yê dûr

qebûl dike. Pileyên livandinên movikên wekî enîşk, zend û sermil hene. Ji bo wesifandina îşaretê bingeha balê li ser dest e û şikil, cîh, livandin û berê dest e. Ji bo pênasîya fonetîk ya îşaretan artîkulasyonên nebidestkî jî daxil dike: artîkulasyonên çene û serî, herdu mil û dest. Di artîkulasyonên rû da hestiyê çena jêrîn bihereket e.

Di zimanên îşaretan da pejirandina dest wateyê berovajî nake. Sutton-Spence & Woll (1999) û Crasborn (2012, s.17) pejirandina dest (*handedness*), wekî pîvanek ji pêkhatina fonetîk pênasî dike, yanî destnîşanker çep-sereke (*left-dominant*) ye yan jî rast-sereke (*right-dominant*) ye. Yanî destê çepê bi kar tîne yan destê rastê bi kar tîne. Heman tişt ji bo ASL û ZAK jî derbasdar e. Di ferhengê da ji bo îşaretan tu dest nehatiye pejirandin. Destnîşanker dema diaxivin nanêrin yê destnîşan dike çep e yan rast e, kîjan destê wan sereke be wî destî mîna artîkulatorê sereke bi kar tînin. Yê ku destê rastê bi kar tîne destê sereke destê rastê ye û ev dest destê bihêztir û yê bikontrol e. Destê nesereke qelstir e û hindiktir manîpulekirî ye. Carê dema destê sereke dilive destê nesereke naliv e, yan jî herdu bi hev ra dilivin.

Hin tiştên çandî hene ku bandor li ser îşaretan kirine. Yek ji wan ew e ku di nav civakê da gustîla zewacê dikeve tiliya gustîlkê ya çepê, gustîla nîşanê/destgirtîbûnê dikeve tiliya gutîlkê ya rastê. Ev çand bandor li ZAK jî kiriye ku tiliya çepê îşareta mêr yan jî zewicî ye, ya rastê îşareta destgirtî ye. Di van herdu îşaretan da destê sereke kîjan be jî êdî negiring e. Yanî ev îstîsnayeke destê sereke ye.



Bi Mêr

Destgirtî

### Şekil 8: Destgirtî û Bimêr Îstîsnaya Destê Sereke

Di mînaka jêr da tîpên elfabeyê mamosteyêke rast sereke nîşan daye ku berovacî xuya dîkin. Lê ev nîşandan jî neçewt e. Emê tenê destê mamoste nîşan bidin.



**Şekil 9: Destê Sereke û Nîşandana Tîpan**


### **1.3.2. Parametreyên fonolojîk yê îşaretan**

Hêmanên bingehîn yê nav avahiya fonolojîk wekî “şiklê dest (*handshape*), cih (*location*), livandin (*movement*), berîdan (*orientation*) û livandinên ji xeynê dest” di ZAK da jî hatine qebûl kirin. Wekî ku Moen (2015) dibêje, şiklê dest, şikil û cîyê tiliya beranî û tiliyên din; cih, cîyê ku li valahiyê yan li ser laş îşaret lê çêdibe; livandin, livandina dest û milan e. Berê tiliyan û kefa dest, li jêr, li jor û li herdu aliyên e. Emê li van hêmanan hûr bibin.

Di hemû Zîyan û ASL û ZAK da parametreyên şiklê dest, cih, berê livandinê û livandin bêwate nînin. Johnston & Schembri (2007, s. 284-6) û Meir & Sandler (2008, s.22-3) îdîa dikin ku îşaret ji hêmanên wisa pêk tên ku dişibine fonemên bêwate yê zimanên axaftinê, lê ji wan piçûktir in. Hin taybetmendiyên fonolojiya zimanê axaftinê di Zîyan da tine ne. Peyvên zimanê axaftinê ji dengdar û dengdêran pêk tên. Karnopp (2002) rave dike ku şiklê dest û cih bi hev ra wekî dengdar (*consonant*) tevdigerin, ji ber ku ev hêman xwedî dijberiyên teşedarî ne, lêbelê livandin dişibe dengdêran (*vowel*). Zimanên axaftinê 20-40 foneman bi kar tînin, Zî ji bo îşaretan pêk bînin gelek

şiklê dest, cîh û livandinên bi hev ve bi kar tînin. Di rêbaza kevneşopî da modela şiklê, cîh, livandin û berîdana dest di giringiyeke wekhev da bû.

**Tablo 2: Modeleke Avahiya Îşaretê ya Tradîsyonel**



Fonolojiya îşaretan li gorî modalîteya ziman e, di îşaretan da dengdar tine ne, şiklê destan jî di zimanê axaftinê da tine ne. Li gorî Sutton-Spence & Woll (1999, s.154; -2005, s.5), Johnston & Schembri (2007, s.79) û Meir & Sandler (2008, s.24-6) îşaret, bêyî avahiya navxweyî (*internal structure*) ya îşaretan nayên analîzkirin û venaqetin perçeyên piçûktir. Çawa ku çend dangan tînin cem hev û peyvan pêk tînin, herweha çend hereketan li du hev rêz dikin û îşaretan ava dikin. Di xebatên berê da terma cherology (Yunanî: *cheir-hand*) hatiye bikaranîn. Ji bo van, peyveke mîna foneman cheremes hatiye gotin. Îşaretên di ASL da ji çar parametreyên bidestkî pêk tên: şiklê dest, cîh, livandin, berê livandinê û taybetiyên nebidestkî.

**Di fonolojiya zimanê îşaretan da dabeşkirina taybetmendiye n îşaretên bidestkî (*manual*) (Brentari, 2005):**

**1. Şiklê dest**

- a. Hejmara tiliyên hilbijartî û yê nehilbijartî
- b. Teşeyên movikan
- c. Şiklên dest yê ne diyar: teşegirtina tiliya eşedê yan jî hemû tiliyan
- d. Şiklên dest yê diyar: teşegirtina tiliyên hilbijartî

**2. Livandin**

- a. Livandinên mezin (*path*) û herêmî (*local*)
- b. Livandinên mezin: kevane, rast, çember

**3. Cîyê movikîbûnê (*location*)**

- a. Serî, sermil, laş û destê ne-sereke

#### **4. Berîdan**

- a. Destnîşankirina berîdana dest ya movikîbûna di şiklê dest da
- b. Beşên destê ku ji bo berîdanê tê bikaranîn: kefa dest, sertilî, pişta dest, pişta tiliyan, nava dest (*radial*) û derveyê dest (*ulnar*), kêleka dest

#### **5. Îşaretên ji xeynî dest**

Pfau & Quer (2010), îşaretên ji xeynî dest bi sê beşa va dabeş dikin.

- a. Livandinên serî û laş
- b. Mehd/mirûz
- c. Livandinên dev

## BEŞA DUYEM

### 2. SERPÊHATIYA PERWERDEYA ENSTÎTUYA HÎWAYÊ

#### 2.1. Dîroka Zimanê Îşaretan Yê Kurdî

Zimanê Îşaretan yê Kurdî, zimanê kerrên kurd yên Herêma Kurdistanê Îraqê (HKÎ) ye. Ev ziman, bi Silêmanî, Hewlêr û Dihokê sînordar e ku li van bajaran bi navê Hîwa dibistaneke kerr û lalan (li herêmê ji bo kerr û lalan peyva “nabîst/ نابيست” tê bikaranîn) heye. Li herêmê terma zimanê amaje “sign language” bikar tînin, lêbelê peyva “îşaret” ji erebî wergirtine, kurdîya (Sorani) wê “hêma/ هئما” ye. Di fermiyetê da dêvla peyva “îşaret”, peyva “amaje/ ئامازه” tê bikaranîn. Ji ber vê jî ji vî zimanî ra dibêjine “zimanê amaje”. Jaza (2015), peyva “amaje” kêmwate dibîne, amaje tê wateya jest (gesture) yan îma (allusion), yanî amaje wergera van peyvan e. Bi vî awayî Zimanê Amaje bi wateya “zimanê jestan” yan jî “zimanê îmayan” tê sînorkirin. Bi min bikaranîna van terman ya fermî yan nefermî çewt e, ji ber ku ew fikra çewt a berfireh nîşan dide ku zimanê nîşanê ji jêstên hêsan/ji rêzê pêk tê û gerdûnî ye. Ji ber vê, dêvla ku “îşaret” yan “amaje” bikar bînim, terma Zimanê Hêmay Kurdî (ZHK) “Kurdish Sign Language (KurdSL)” bi kar tînim, ji ber ku destnîşanker kurd in û civaka kerr ji aliyê dîrokî û çandî ve girêdayî gelê kurd e. Ev nêrîna Zana Jaza ye. Lêbelê, li Hewlêrê jî hin xebat hatine kirin û xebatkarên din terma “Zimanê Amaje Kurdî” û kurteya wê “ZAK” bikar anîne. Ji ber ku di fermiyetê da “amaje” tê bikaranîn, lêkolînerên zanîngehên Hewlêrê û Silêmanî jî ZAK bikar tînin û di gotarên wan da ji dêvla ZHK, ZAK tê dîtin. Li vir ji aliyê kurteyên navên zimanan va tevliheviyeke zanistî çêdibe. Fikra hin zimannasan ew e ku kurteya Kurdish Sign Language bi KurdSL nîşan didin, ji ber ku kurteya navê Kuwaitian Sign Language jî bi KuSL tê nîşandan, tevliheviyek çêdibe. Ji ber ku li HKÎ di hemû xebatên akademîk û dibistanan da KuSL tê bikaranîn, êdî ev kurtenav rûniştiye û divê KuSL bê bikaranîn. Îca emê navê vî zimanî bi kurdî çawa kurte bikin? Belê Zana Jaza di vî warî da xebata pêşî kiriye xuya dike û binavkirina yekemîn ZHK xuya dike, li gorî agahiyên di dets da. Lêbelê îro li HKÎ di fermiyetê da û di gotarên ku hatine nivîsîn û li dibistanên Hîwayê da jî “zimanê amaje”

tê bikaranîn, heta ku navê aplikasyona ku li ser Googel Play Storeê û App Storeê çêkirine jî “amazha.app/” (AppStore, 2023) ye. Divê Zimanê Amaje Kurdî (ZAK) û KuSL bê bikaranîn. Emê jî êdî ji bo zimanê îşaretan ZÎ bikar bînin.

Di saziyên Hîwayê da wisa tê bawer kirin ku ZAK li her sê bajarên navborî xwedî zaravayên cuda ye, lê ji ber ku zimanê îşaretê li Herêma Kurdistanê Iraqê beriya niha jî aliyê zimannasan ve nehatiye lêkolînkirin, ne diyar e ku nîşana li hundir û navbera her sê bajarên cuda heta kîjan astê dişibe hev. Lê belê, ji ber ku li her bajarî herî kêr civateke herêmî ya kerr heye, di ZAK da hin cudahiyan herêmî hene. Civateke herêmî bi rêya perwerdeyên li saziyên Hîwayê û carnan jî bi rêya çalakiyan atletîk û çandî bi hev ra di nava têkiliyê da ne. Cihêrengiya ziman, di cudahiyan lexical ên li gorî destnîşankerên kerr bi xwe da, û herweha ferhengeke çapkirî ya îşaretên ku di çarçoveya hînkirinê da tên bikaranîn, tê dîtin.

Nifûsa Herêma Kurdistanê li gorî jimartina 24.02.2025an 6503000 e (Rûdaw, 2025), lê çavkaniyeke pêbawer tine ye ku hejmara kesên ZAK destnîşan kirine nîşan bide û ne diyar e ku çend kerr û lal hene. Di ferhenga nîşanê da texmîn dike ku li tevahiya herêmê nêzî 10 hezar kerr hene û qeyda li Midûriyeta Karûbarên Astengdariyê li bajarê Silêmaniyê 1050 kes wekî kerr lîste dike. Lêbelê ti çavkanî li ser hejmara destnîşankeran fikreke zelal nade.

“Saziyên li sê bajarên di nava 30 salan da, bi tevahî ji 1000î zêdetir xwendekarên wan çêbûne, û dibe ku ev texmîn hejmara herî nêz ya destnîşankeran be.” (Jaza, 2015). Afirîna ZAK bi saziyên perwerdeyê ku li Kurdistanê ji bo zarokên kerr û lal hatine avakirin ra têkildar xuya dike. Li gorî International Organization for Migration (IOM, 2024), li Kurdistan Region of Iraq (KRI), kurdiya soranî û badînî tê axaftin. Li KRI ZAK tê bikaranîn. Li Iraqê, ji bilî KRI, ji sedî sed zimanê îşaretan erebî (*Iraqi Sign Language*) tê bikaranîn. Li gorî IOM kerrên HKÎ ji sedî 90 bi ZAK ragihandina rojane pêk tînin û cudabûna di navbera sê zaravayan da qebûl dikin û standardeke wekî zimanê îşaretan ya navnetewî (ISL) ji bo ZAK jî dixwazin. Dema ku hin kerr û lalên ji derveyê HKÎ dibînin, derbasî zimanên îşaretan yên din dibin, yanî bi zimanê ArSL (*Arabic Sign Language*) û ISL jî zanin.

Enstîtûyên Hîwayê 1980an va ava bûne û heya îro bi sedan xwendekarê wan çêbûne. Enstîtû, ji aliyê rêveberîyeke girêdayî Wezareta Karûbarên Civakî ya Iraqa berê hatibû avakirin. Bi niyeta rehabilitasyona zarokên kerr û lal hatine avakirin û zarokên berasteng jî qebûl kirine. Salên 1990î rewş guherîye û tenê zarokên kerr û lal qebûl kirine.

Ji avabûna Hîwayê heta sala 2003an hem ji bo mamosteyan hem ji bo xwendekaran pir zor bû û bêistîkrar û tije pirsgerêk bû. sedemê vê ne tenê ji hev famkirina herdu aliyan bû, rewşa Iraqê ya ewlehiyê û herbên ku Iraq tevî bûbû û encamên van herban jî sedemek mezin bû. Tê zanîn ku salên 1980yî da Iraq di kontrola Saddam Huseyîn da bû. Wê demê pir zilm li kurdan hatiye kirin. Rejimê li hember kurdan polîtîkayên pir hişk dimeşand, heta nefî û kuştinan. “Li hember sivîlan kampanyayên jenosîdê dimeşand, ji wan ya herî pir tê zanîn li Helebçê di rojekê da 5000 sivîl bi çekên kîmyevî hatin qetilkirin.” (Human Rights Watch/Middle East, 1995). Ev rewş xwe di qada perwerdeyê da jî nîşan dida. Li gorî agahiyên Jaza (2015), çand û zimanê erebî li ser hemû saziyên perwerdeyê bandoreke bi tirs û bi tund xwe nîşan dida. Hîwayê jî ji Bexdayê bernamêyên perwerdeyê distand û ew jî ji vê rewşê nesîbê xwe girtibû. Lê mamosteyên Hîwayê kurd bûn û ji Silêmanî, Hewlêr û Dihokê dihatin û di derheqê perwerdeya kerr û lalan da ti perwerdeya wan û tecrûbeya wan tinebû. Di ragihandina rojane ya bi zarokan da mecbûr bûn ku destnîşankirinê hîn bibin û rê û rêbazên xwe yê hînîkirinê çêbikin.

Salên 1990î ji bo kurdan pir zor bû. Bi kurtasî gava ji bin bandora dîktatoriyê derketin, bi taybetî ji aliyê aboriyê, rewş pir xera bû. Lêbelê rewşa civakê bi awayekî erênî guherî, êdî mirovan fikrên xwe dikaribûn bi azadî bêjin. Mirovên kerr jî bi xêra vê rewşê civakên xwe dîzayn kirin. Wê demê bi alîkariya saziyên civaka sivîl yê navnetewî gelek sazî hatin sazîkirin û bi vî awayî yekem car li Hewlêr rêxistineke kerr û lalan hate sazîkirin. Saziyên mehelî, dest bi piştgiriya civaka kerr û lalan jî kirin. Ev şert û merc derfet dan ku mirovên kerr û lal di mekanên ji dibistanan lîberaltir da hev nas bikin. Bes jixwe dibistan demeke dirêj girtî mabûn. Bi saya avabûna saziya kerr û lalan û avabûna civaka kerran ZAK pêş ket. Berî enstîtûyên Hîwayê di derheqê kerr û lalan û zimanê wan da pir hindik tişt dihat zanîn.

Berî salên 1980yî li Silêmanî bi giştî dihat zanîn ku mirovên kerr jêhatî ne, bi giştî xwedî kar bûn û zewicîbûn. Lê ti agahî tine ku bi hev ra çiqas têkildar bûn yan civakên mezin kom kirine. Yê ku destnîşankirine ew in, lêbelê ev destnîşankirina wan cûreyeke îşareta malê (*home sign*) ye yan pergaleke zimanî ya pêşketî û tevlihevtir e, ne diyar e.

Li gor Hendriks (2008, ss. 25-26), di navbera Zîyên ereban û Tirkiyê da ihtimala bandoreke beramber heye. Bingeha vê ihtimalê ev e: Di sedsalên 16. û 17. da (Miles, 2000) di qesrên Osmaniyan da tê zanîn ku destnîşan hebû. Wekî vê, ihtimala mirovên kerr yê li Kurdistanê û destnîşanên dadgehên sultanên Osmaniyan têkiliyek danîbin heye. Lê ji bo vê ihtimalê di dest da ti delîl tine û bajarê Silêmanî jî di sedsala 18. da ava bûye û ev jî vê ihtimalê qels dike.

Li gorî mamosteyên Hîwayê dîroka perwerdeya zarokên kerr yê li Iraqê kevtir e. “Enstîtûya li Silêmanî, naveroka perwerdeyê salên 1980yî ji Bexdayê girtiye. Ji ber ku sala 1991an da têkilî qut bûne, peywendiya ZAK û Zîyên li Bexdayê yan li devereke din yê Iraqê heye yan tineye ne teqez e.” (Jaza, 2015).

Digel ewqas xalên peyvî dişibine hev, tê dîtin ku ZAK zimanekî cuda ye. Bi Zî û dibistanên Iraqê ra peywendiyek daneniye û xwe bi xwe çêbûye. Lêbelê ji bo ku mirov bêje rastî teqez ev e, divê hin lêkolînên zimannasîyê bên kirin. Ev yek jî pir zehmet e, ji ber ku zimanên li Iraqê ji aliyê zimannasan va pir pêwendî nedîtiye.

Zana Jaza dibêje:

Mamosteyekî Hîwayê ya li Silêmanî dibêje, li salên 1980yî, ji bo doza kurdekî kerr hatiye vexwendin, ji aliyê dadgeha Bexdayê. Ji ber ku ew mirov Zîya ku li Bexdayê hîn bûbû bikar dianî wergêrî bêncam dimîne ku ev ziman pir cuda bû. Wekî vê mînakê pir mînak hene, lê ev ne delîlê cudatiya herdu zimanan e. Lêbelê baweriya giştî ew e ku ZAK û Zî ya li Bexdayê ne heman zimanin. (s. 736)

Ji xeynî Silêmanî li Hewlêrê jî şaxeke Hîwayê heye ku sala 1980yan da vebûye û dibistana kerr û lalan a yekemîn e.



Şekil 10: Lewheya Hîwa Ya Hewlêrê

## 2.2. Perwerde

Me agahiyên di derheqê perwerdeya li HKÎ û li dibistanên Hîwayê da bi piranî ji gotara Jaza (2015) wergirt. Ji ber ku burokrasiya HKÎ pir tund bû û ji bo agahiyan bidin îcazenameyan dixwestin, hewldanên me bêncam man. Me jî sernava perwerdeyê bi agahiyên gotarê sînordar kir.

Li gorî Zana Jaza (2015)

Li herêma Kurdistanê perwerdeya bingehîn ya mecbûrî heye û bi tevahî 9 pol in. Notên xwendekaran di 9 salan da temam dibin û perwerde bi Azmûna Neteweyî temam dibe. Piştî perwerdeya bingehîn ji nav çend alternatîfan yekî hildibijêrin. Dikarin perwerdeya pîşesazîyê yan perwerdeya bazirganîyê ku 2 yan 3 sal in hilbijêrin, yan jî dikarin beriya ku derbasî perwerdehiya bilind bibin di asta amadehiyê da 3 sal perwerde bibînin. Zarok di 6 saliya xwe da dest bi dibistanê dikin, lêbelê dikarin 4 yan 5 salî dest bi pêşdibistanekê jî bikin.

Zarokên kerr û lal yê Silêmanî, di 4 salî da dikarin dest bi pêşdibistana Enstîtuya Hîwayê bikin. Şertê qebûlkirina xwendekaran ji bo dibistana Hîwayê ewe ku zarok berastengê bihîstinê be (yan kerr be yan lal be hwd.), lêbelê ji vê pê ve divê ti berastengiyên zarok tine bin. Di polên pêşdibistanê da kurdiyeke bi destan hatiye kodkirin tê bikaranîn û bi giştî 8 zarok perwerde dibin. Zarok dema beşdarî çalakiyên rojane dibin, îşaretên fer (single signs) nas dikin û hin amûrên ku di çalakiyan da tên bikaranîn bilêvkirina navê wan yê kurdi hîn dibin. Lêbelê perwerdeya bilêvkirinê ne ji bo zarokên kerr û lal e, ji xwe nikarin bi ser bikevin jî. Gava zarok tî 6 salî, êdî dest bi dibistana din dikin ku ew dibistan jî di nav heman avahiya dibistanê da ye lê li rexekî din e. Di polên dibistanê da tevahî nêzî 100 xwendekaran hene.

Ji bo ku pola nehemîn û perwerdeya bingehîn temam bikin, yanî serkeftî bîn hesibandin, divê azmûna neteweyî da ser bikevin, lêbelê hê jî îcaze nadin ku zarokên kerr û lal bikevin azmûnê. Yê ku bixwaze perwerdeya xwe bidomîne ango di karê memûriyê de bixebite divê herî kêm azmûna neteweyî derbas ke. Ji ber vê, tu fersendên kerr û lalan tine ye ku bîyî bawernameyeke azmûna neteweyî perwerdehiya xwe

bidomînin yan jî têkevin karekî qenc. Hem ji aliyê aborî hem ji aliyê îdarî va ji bo îstihdamê bawernameya perwerdehiya bingeîn şert e.

Ji xeynî vê bawernameya perwerdehiya bingeîn hebe jî îcazet nadin kerr û lalan ku piştî perwerdehiya bingeîn a 9 salan perwerde bistînin. Sedemekî vê kêmasiya perwerdehiya kerr û lalan û kêmasiya zanîna zimanê îşaretan e, sedemek jî tinebûna mafên zagonî yên xizmeta wergêriyê ye.

Pêdiviyên perwerdeya fermî û kênzanînen zimanê îşaretan, Enstîtûya Hîwayê mecbûr hiştiye ku mufredatên hemû dibistanên seretayî yên li herêma Kurdistanê bişopîne. Yanî xwendekar divê bi kurdî, erebî û îngilîzî karibin bixwînin, binivîsin û heta ku dibe hînî axaftinê bibin.

Ji bilî vê, li Hîwayê zanistên mîna matematîk, fîzîk, kîmya, dîrok, erdnîgarî hwd bi awayekî bingeîn tîn fêkirin. Temamkirina mufredatê yê xwendekarên kerr û lal li gorî xwendekarên normal demeke dirêjtir divê, bi giştî pola salekê di 2 salan da temam dikin.

Felsefeya perwerdekirina xwendekarên kerr û lal, li ser rehabilitêkirin û entegrekirina civakê ye. Yanî heta dikarin axaftin û bilêvkirinê wê hîn bibin. Di polan da mamoste û alîkarên/asîstanên wan yên kerr û lal perwerde didin. Asîstanên kerr û lal jî bi giştî ji xwendekarên ji Hîwayê mezûn bûne tîn hîlbijartin. Hem li pêşdibistanê hem li dibistanê kurdîyeke bi destekî kodkirî tî bikaranîn. Yanî kurdîya ku mamoste li Hîwayê bikar tînin, kurdîya axaftinê ye ku rêza peyvan dişopîne û her peyvek ji îşaretekê pêk tî.

Mamoste bi giştî ji bo îşaretan/destnîşankirinê destekî xwe bikar tînin. Ji ber ku destê din ji bo girtina pirtûkê yan jî ji bo nivîsîna texte bikar bînin hêsantir e. Mamosteyên enstîtuyê heta dikarin ji ferhenga kerr û lalan îşaretan bikar tînin. Ji xwe ferheng ji bo xwendekarên kerr û lal, malbatên wan û mamosteyan hatiye amadekirin. (ss. 737-738)

Lêbelê, ji ber sedemên nediyar, êdî tenê ji bo hînkirinê tî bikaranîn û bê îcazet nîşanî kesên din jî nakin. Ji bo ku ferhengek bi dest bixin, divê ji rêvebiran îcazeta bi taybet bistînin, yan na nadin kesên din.

### **2.3. Zarava**

Di qadê da me ji hemû mamoste û aktîvîstan û ji xebatên zimannasiyê dît ku sê zaravayên ZAK hene. Ev zarava li gorî civakên kerr û lalan yên sê bajaran, bi awayekî xwezayî çêbûne. Li hewlêr û Silêmanî soranî, li Dihokê badînî (kurmancî) tî axaftin. Lêbelê zaravayên ZAK li gorî çî çêbûne, hevşibîn û cudabûnên wan di çî astê da ne nayê zanîn. Lewra heta niha li ser zaravayên ZAK ti xebatên zimannasiyê nehatiye kirin. Lêbelê tî zanîn ku dabeşbûna zaravayan li gorî civakên kerr û lalan, li gorî pergala perwerdê, çand û zaravaya serdest e. Qesda me ya pergala perwerdê dibistanên kerr û lalan yanî enstîtûyên Hîwayê (bi kurmancî Hêvî) ne.

## 2.4. Standardîzasyon

Standardeke Zimanê Amaje Kurdî tine ye û ji bo standardîzasyonê xebatên sistematîk jî tine ne. Her wiha armanca avakirina ferhenga kerr û lalan, bi rêya bikaranîna ferhengê nêzî hevûdu kirina zimanên amaje bû. Pêşî fikra amadekirina ferhengê ji aliyê xebatkarê misrî yê saziya navnetewî ya MEDSê Subhî Halîm va hat pêşniyarkirin. Ji bo ku zarok li dibistanan hêsantir hîn bibin, pêşniyar kir ku enstîtûya Hîwayê ferhengê amade bike. Mamosteyan ew fikir ecibandin û qebûl kirin. Di demeke kin da ev fikir mîna projeyekê ji aliyê UNICEFê hate finansekirin. Di nava çend salan da ferheng hate çapkirin. Di heyeta rêvebiriyê ya ferhengê da, nûnerên her sê enstîtûyên Hîwayê cih girtin, û nûnerên saziyên kerr û lalan û yên nekerr û lalan yên Hewlêr, Silêmanî, Duhokê jî cih girtin. Tiştên ku ji aliyê perwerdê va bikêrhatî bin, pêşî lîsteya wan amade kirin. Pişt ra li ser, ji bo temsîlkirina hêmanên fergengê kîjan îşaretan wê bikar bînin li hev kirin. Li enstîtûyên Hîwayê, ji îşaretên ferhengê ra, îşaretên sabit tê gotin. Bi rastî, ferhenga kerr û lalan tenê lîsteya îşaretan e û tê da hevok û mînakên bikaranînê tine ne. “Ji bo zarokan hatiye nivîsîn û tê da 2400 îşaretên kit hene ku qismek ji van bi xêzkirinê tên nîşandan. Di binê xêzan da şîroveyên rêya îşaretan, şîroveyên hereketên navgîn û şîroveyên guhêrînên îşaretên destan bi kurdî tên kirin.” (Halim & Russel, 2002).

## 2.5. Bandora Zimanên Serdest

Tiştê ku me ji şîroveya Jaza (2015) fam kir, ti pêwendiya rasterast zimanê îşaretan yê kurdî bi tu zimanî ra tine ye. Lê bi rêya ferhenga kerr û lalan û kanalan, îhtimala bandora hin zimanên îşaretan dibe ku bê qebûlîkirin. Komîteya amadekirina ferhengê, di serî da ji Zimanê Îşaretan yê Holandî (NGT) û ji hin ferhengên zimanên îşaretan sûd wergirtine. Bi vî awayî hejmarên/reqemên ferhengê bi temamî ji NGT hatiye girtin. Her wiha qismek îşaretên ferhengê ji zimanên îşaretan yên Ewropî hatiye girtin. Ji ber ku mamosteyên Hîwayê ji aliyê bikaranîna ferhengê va lihevkiyê ne, di navbera ZAK û zimanê îşaretan yên Ewropî da hevşibînên îşaretan normal e.

Destnîşankerên kurd, bi şîrovekirina nûçeyên ku ji aliyê hin kanalên televîzyonê satalaytî yên ereban va bi zimanê îşaretan hatine pêşkêşkirin ra eleqedar

in. Loma, dibe ku hinek bandora van zimanên îşaretan li ser ZAK hebe. Li gorî hin lêkolîneran (Abdel-Fattah, 2005; Al-Fityani, 2007; Hendriks, 2008; Al-Fityani & Padden, 2010) li Rojhilata Navîn teşebusên zimanekî standart yên îşaretan erebî çêbûye. Zimanê îşaretan ku di televîzyonên satelaytî da tê bikaranîn, tê qebûlkirin ku cureyeke standart ji zimanên îşaretan yên ereban e.

Çawa ku ZA bandor li hev dikin, ZÎ jî bador li hev dikin. Her wekî ku Jaza (2015) jî dibêje, bi giştî ji listeyeke îşaretan ku ji zimanên cuda yên ereban pêk hatiye û bi piranî di bin bandora Zimanê Îşaretan ya Urdin (LIU) da maye. Loma, ku li ser ZAK bandora cureyek zimanekî standart yê îşaretan ya erebî hebe, nexwe bandoreke nerasterast ji LIU heye. Bi taybetî hin mamoste û asîstanên kerr û lal, demekê li Urdin beşdarî kursekê bûne û bi kerr û lalên Urdinê ra rasterast têkildar bûne. Bi rastî ev têkilî hê jî heye û pîsporên LIU û perwerdeya kerr û lalan yên Urdinî carinan ji bo agahî û tecrûbeyên xwe bi enstîtûyên Hîwayê ra parve bikin Kurdistanê zîyaret dikin.

Ji bilî vê ZAK, bi kurdiya axaftinê û hinek jî bi erebiya axaftinê ra rasterast têkildar e, lêbelê heta niha li ser vê îxtimala bandorê ti lêkolîn nehatiye kirin.

Ji xeynî van, ZAK ji ASL jî hin îşaretan girtiye, yanî ASL bandor li ZAK kiriye. Lêbelê heta niha li ser vê bandorê tu xebat nehatiye kirin.

## **2.6. Konteksa Sîyasî û Civakî**

### **2.6.1. Rêxistin**

Li Kurdistanê ji bo civata kerr û lalan du cure rêxistin hene. Rêxistina ewil, Rêvebiriya Karên Berastengan e ku li her bajarî şaxeke wê heye. Ev şax girêdayî Wezareta Kar û Xebatên Civakî ne. Meaşê berastengiyê didine kerr û lalan jî. Û berpirsyarê her sê dibistanên Hîwayê ne jî. “Ji ber ku mufredata ku li hemû dibistanan tê bikaranîn li Hîwayê jî bi kar tînin, tevlê naveroka perwerdeya Hîwayê nabin. Berpirsyarê guhertin û kontrolkirina mufredatê Wezareta Perwerdeya Netewî ye.” (Jaza, 2015).

Rêxistina duyemîn, saziyên civaka sivîl in. Li her sê bajarî çendîn rêxistin hene. Rêxistina herî mezin “Komeley Kerûlalanî Kurdistan” e. Ji 1992an heya 1996an aktîf

bûye. Bi alîkariya saziyên navnetewî yên alîkariyên însanî, kursan didan mirovên kerr û lal ku hunerên xwe pêş bixin û hay ji kerrbûn û civakên kerr hebin. Û yên ku xwe gihandin saziyê, her meh alîkariya madî bi wan dikirin. Ji ber bêistîkrariya siyasetî û şerên navxweyî yên herêmê, sala 1996an dev ji kar berdane. Sazî hê jî heye, lê tu xebatan nake.

Rêxistineke din jî “Rozh” bû. Ji xeynî kerr û lalan alîkarî dida hemû berastengan. Di salên 1990î da xebat dikir. Ew jî wek Komeley Kerûlalanî Kurdistan bû û dev ji xebatan berda.

Rêxistineke din jî “Kurdistan Save the Children” (KSC-KCF) bû. Ev sazî bi piranî li ser tendurustiyê dixebitî. Ji bo zarokên kerr û lal emeliyatên îmantên amurên bihîstinê çêkirine. Ev sazî hê jî xebatên xwe didomîne.

Ji xeynî saziyên mehelî, saziyên navneteweyî yên wekî MEDS û UNICEF jî alîkariya Hîwayê kirine. Bi taybetî piştî şerê Iraqê (2003).

Yek ji wan saziyan “Stichting Soz Fond” e. Ji bo nûkirina avahî û kirîna kelûpelên dibistanê û amûrên perwerdehiyê alîkariya Hîwayê kiriye. Ev sazî hê jî li Holanda karên xwe didomîne.

Yek ji wan saziyan “Kentalis” e. Bi Hîwa û Wezareta Kar û Xebatên Civakî ra 3 sal xebitîn, projeyek domandî. Proje, bi taybetî li ser perwerde û stratejiyên hînbûna kerr û lalan bû. Li ser vê hin kurs dan. Kursê bandoreke erênî hem li ser xwendekaran hem li ser mamosteyan kir. Lêbelê ji ber pîrsgirêkên aborî û ji ber zorbûna pratîkê dewam nekir. Ev sazî hê jî li Holanda karên xwe didomîne.

Yek ji wan saziyan “CBM International” (ji bo pêşxistina xiristiyanan dixebite) jî li Urdin û Kurdistanê ji bo mamoste û asîstanan kursan vekir. Ev sazî hê jî li Almanyayê karên xwe didomîne.

Îro li Kurdistanê saziya herî çalak Kurdistan Deaf Communities e. Ji bo mafên civaka kerr û lal, civînan dîkin, çalakiyên dîkin, derdikevin qada û protestoyan dîkin. Ji bo hînkirin û danasîna ZAK kursan vedikin û vîdyoferhengê amade kirine. Ne tenê herêmî dixebitin, xebatên navnetewî dîkin. Bi kerr û lalên biyanî û aktîvîstan ra çalakiyan dîkin. Ji bo endamên civaka kerr û lal xwe nîşan bidin û hunerên xwe nîşan

bidin civînan dîkin. Daxwazên civaka kerr û lalan digihînin heta hikumetê û hemû welatiyan. Daxwaza herî mezin naskirina fermî ya ZAK e.

Ji xeynî van saziyan îro jî hin saziyên mehelî û hin saziyên navneteweyî alîkariyan didin Hîwayê. Alîkarî bi piranî li ser aboriyê ne. Van salên dawî, bi pêşketina înternet û medyaya civakî hin aktîvîst jî alîkariyan didin hev, dikevine têkiliyê. Û bi vî awayî civakên kerr û lalên Kurdistanê û yên dinyayê pirtir dikarin bikevin têkiliyê. Ji xeynî saziyan hin zanîngehên li Kurdistanê jî carinan alîkarî dîkin, carinan jî bo nasandina civaka kerr û lalan çalakiyan çêdikin ku xwendekaran dibin Hîwayê û xebatên Hîwayê didin naskirin.

Îro li zanîngehên HKÎ bi dildarî, mîna mamosteyê Zankoya Selahedîn, mamoste Cewher Karox, bi dildarî xebatên Hîwayê didin naskirin. Li ser medyaya civakî mamosteyên Hîwayê mîna Ahmed Ajib Alî, Shno Ahmed; aktîvîstên mîna Hannah Hoot ZAK didin naskirin. Û hin mamosteyên Hîwayê û mamosteyên dildar li ser Youtube kanalên ZAK ava kirine û videoyan parve dîkin û dersên ZAK didin.

Ji bilî van, zanîngeha emerîkî ya Kurdistanê (American University of Kurdistan), li Duhokê, 2023an da kursa wergêriya ZAK da. Kurseke 112 saetî bû û zimanê kursê badînî û KuSL bû. Li dinyayê yekem car kursa wergêriyê ya ZAK bû (AUK, 2023).

#### **2.6.2. Bikaranîna zimanê îşaretan di konteksê da**

Ji ber ku zimanê îşaretan (ZAK) zimanekî nenaskirî ye û di jîyana fermî da nayê bikaranîn, bi civaka kerr û lalan va sînordar e. Wekî her deverên dinyayê, kerr û lalên Kurdistanê jî, bi piranî bi civaka kerr û lal ra têkildar in. Kesên jî civaka kerr û lal, pirtir dixwazin hev nas bikin, bi hev ra bixebitin, wext derbas bikin û bi giştî heval in jî. Civaka kerr û lal pirtir bi hev ra dizewicin. Hin jî wan xwedî zarokên kerr û lal in. Malbatên kerr û lal jî bi hev ra têkildar in, bi malbatî diçin malên hev. Bi vî awayî ZAK bi kar tînin û belav dîkin.

Hin zîlamên civaka kerr û lalan, wekî merengozî, bi taybetî karên destkarî dîkin. Bo nimûne, li Silêmanî, kargeheke merengozî heye ku jê ra dibêjin merengoza kerr û lalan, xebatkarê wê tev kerr û lal in. Merengozên kerr û lal tev bi hev ra dixebitin, bi rê ve dibin, têra debara wan neke jî ji vê xebatê kêfxweş in. Li Hewlêrê, nanopêjek heye

ku hoste û xebatkar tev kerr û lal in. Ji bo mirovên kerr û lal bêhtir têkevin nav civakê û hîn bibin ku di nav civaka kerr û lal da çi dibin çi nabin û agahiyên xwe nû bikin, çayxaneyê wan heye. Hin ji wan birêkûpêk werzişê dikin û tîmeke wan ya fitbolê heye.

Derfetên jinên kerr û lal hindiktir in. Lê hin ji wan hê jî di hin saziyên fermî da dixebitin. Hin ji wan karên destkarî dikin. Li Silêmanî jinên kerr û lal hene ku bi mişterîyên kerr û yên lal ra jî têkildar in. Hin saziyên navnetewî û yên mehelî li Hîwayê çalakîyan li dar dixin. Di van çalakîyan da jinên kerr û lal yên ku rêya wan ketiye Hîwayê, hunerên xwe yî destkariyê nîşan didin. Bi morîkan tîzbî, bazin, qolye; bi neqşa bi tentena çarîkan hwd. çêdikin û difiroşin. Nîşan didin ku mirovên kerr û lal jî mîna mirovên din dikarin her karî bikin. Kerr û lalên Kurdistanê di jiyana rojane da bikaranîna ZAK da ji xwe bawerin.

### **2.6.3. Nêrîna gel ya di nav civakê da**

Li Kurdistanê yên ku kerr û lalan nas nakin yan jî têkiliya wan bi civaka kerr û lalan tine be ZAK nizanin, hay jê jî tinin. Ev nîşan dide ku civaka kerr û lalan civakeke marjînal maye, ZAK pir bala kesî nakişîne, li ser ZAKê lêkolînên zanistî pir çênebûne û pir kesî serê xwe pê neêşandiye. Belê miameleyê xirab li kerr û lalan nehatiye kirin lêbelê civak pir derfet nedaye mirovên kerr û lal ku têkevin nav jiyana civakî û tede cih bigirin.

Li zanîngehên Kurdistanê li ser zimanên îşaretan pir lêkolîn nayên kirin. Yên hene jî bi tevahî 17 gotar in. Lêbelê gotarên heyî jî, ji xeynî sisêyan, ne li ser danasîna ZAK yan jî rêzimanê wê ye. Yên ku li ser ZAK xebitîne jî ne zimannas in, bi giştî endezyar in. Xebatên hatine kirin bi giştî wekî danasîna îşaretan ya bernamêyên android in ku îşaretan wergerînin nivîsê. Sedemeke vê, kêmasiya zanista zimannasiyê ya li ser zimanê îşaretan e. Sedemê mezin jî eve: Zimannasên zimanê kurdî bi giştî xwe dane ser “parastin, pêşxistin û xizmetkirina” zimanê kurdî yê axaftinê. Zimannasên Kurdistanê bi giştî qebûl dikin ku zimanê kurdî di bin xetereya windabûnê da ye. “Ji ber ku armanc û xebatên rejîma Iraqê ya berê, nefiykirina kurdan, erebkirin û guherandina demografiya Kurdistanê bû.” (Yıldız, 2007: ss. 64-66). Ji ber vê,

lêkolînên ziman yên li Kurdistanê giştî li ser kurdiya axaftinê ne û bala xwe nadin ser ZAK.

Ji ber ne li ber çavanbûn û kêmtanîna ZAK, hin çewtzanîn peyda bûne. Yek ji wan: “ZAK, şîroveyeke zimanê axaftinê ye. Yanî, rêzimanê zimanê axaftinê rêza peyvan e, ZAK jî ji jêstên vê rêzê pêk hatiye.” Ev çewtzanîn û hin kêmdîtînan din jî di nav civaka axêver da belav bûye, lewra îşaretên destkî, cîyê peyvên axaftinê û kêşanên wan bi temamî nagire. Ev bawerî di saziyên perwerdê da guheriye. “Mamosteyên Hîwayê bi saya kursên saziyên navnetewî, çavdêriyên şexsî û jêşûdwegirtinên serpêhatiyên perwerdeya zarokên kerr û lal, xwedî zanista zimannasiya zimanê îşaretan in.” (Jaza, 2015).

Mîrovên civaka kerr û lalan bi zimanê xwe serbilind in û ji kêmdîtina wê gazin dikin. Bawer dikin ku mîameleya tam hevwehatîyê nabînin. Demekê civaka kerr û lalan, ji bo mafê ehlîyetê li kolanan çalakîyên protestoyan kirine, lê maf nedane wan. “2016an maf dane xwendekarên kerr û lal ku êdî dikarin li lîseyên meslekî û teknîkî perwerde bibin.” (Rûdaw, 2016). Ji bilî vê carinan ji dîtina wekî berastengên zîhnî gazin dikin û ji peyva “kerr” aciz dibin. Wateya wê wekî piçûkdîtîna dibînin. Dêvla wê peyvê “nabîst” bi kar tînin ku wateya wê “nabihîse” ye.

Herwiha nêrîna li kerr û lalan ya civakê, nêrîneke bi rehm e. Ev yek bandor li felsefeya perwerdeyê jî kiriye, li nêrîna medyayê ya li ser kerr û lalan jî kirîye, li lêkolînên li ser zimanê îşaretan jî kiriye. Ji ber vê, li Kurdistanê tenê derfetê dibistanê didin wan, yanî ji bo wan dibistan ava dikin lê ji bo perwerdê serê xwe naêşînin. Pir hindik alîkariya madî didin, lê îstixdam nakin. Û zimanê wan wekî şîroveyeke biqisûr ya zimanê kurdî tê dîtin.

#### **2.6.4. Cureyên din yê civakî û herêmî**

Gelê kurd ji aliyê civakê va, jin û mêr di jiyana rojane da tevî hev nabin, hem ji aliyê çandê va hem ji aliyê baweriyê va ji hev cuda ne. Mêrên kerr û lal xwedî çayxane û qîubên werzîşê ne. Bi xêra vê tevî civîn û hevdiîtinan dibin. Lêbelê jinên kerr û lal nikarin tevî van civînan bibin. Ew jî civakên cuda ava dikin. Jinên kerr û lal li hin komele û bazaran hunerên xwe yê destkî hem nîşan didin hem difiroşin û pê debara

xwe dikin. Ev cudabûn nîşan dide ku îxtimal e ku hin cureyên civakên kerr û lalan hebin, lê heta niha tu kesî li ser wan nexebitiye.

Hin civakên kerr û lal hene ku heta niha li dibistanên Hîwayê derfetê perwerdê nedîtine. Hin ji wan li komeleyên kerr û lalan yê alternatîfê Hîwayê dicivin, hin ji wan jî heta niha li tu deverî neciviyane û perwerde nebûne. “Yên herdu civakan jî îşaretên cuda bi kar tînin. Ew kesên civakên cuda, bi takekesên ku li saziyan perwerde dibin ra têkildarin. Ev jî îxtimal e ku di destnîşankirinê da beramber bandorê li hev dikin.” (Jaza, 2015). Hemin wê hebe ku kesên ku neçûne tu saziyan, îşaretên xwe yê cuda, ango îşaretên malê (home sign) afirandibin. Lêbelê li ser vê cudatîyê heta niha tu kes nexebitiye ku ev cudatî di çî astê da ye.

#### **2.6.5. Di konteksta siyasî da ZAK**

Di fermiyetê da mafê ZAK û kerr û lalan tine ye. Li gorî agahiyên Jaza (2015) diyar e ku makezagonên Iraqê mafê perwerdê garantî dike ku her Iraqî zarokên xwe dikare bişîne saziyên perwerdê yê fermî yan jî yê taybet ku bi zimanê xwe yê dayikî yan jî bi zimanekî din perwerde bibe. Lêbelê ne li Iraqê ne li Kurdistanê, ne li ser ZAK ne li ser zimanekî din, di fermiyetê da nayê axaftin û ji aliyê qanûnçêkirinê li ser zimanê îşaretan nayê nîqaşkirin. Ji ber vê, ZAK nayê nasîn û mafê wergêrî/tercûmaniyê yê mirovên kerr û lalan tine ye. Bi rastî wergêrên pisporê ZAK û xizmeta wergêriyê tine ye. Wergêr tenê ew mirov in ku bi saya têkildariya civaka kerr û lal ZAK hîn bûne. Dibe ku ev mirov mamosteyên Hîwayê bin, yan jî dibe ku aktîvîstê saziyên kerr û lalan bin. Gava li dadgehan yan jî li saziyên fermî pêdivî çêbû, bi awayekî fermî wergêran vedixwînin. Lêbelê ji bo karê wergêriyê pere nadin wergêran. Lêbelê 2023yan kurseke wergêriya ZAK li AUKê vebû (me li jor behsa wê kiriye), lê ji bo wergêriyê têrê dike yan nake hê ne diyar e.

Demekê di çend kanalên Kurdistanê da bi zimanê îşaretan bernameyên nûçeyan hate weşandin, demeke kin da ji ber liberrabûnên civaka kerr û lal hate betalkirin. Piraniya temaşevanên kerr û lal tê derxistin ku îşaret nayên famkirin. Kanalên medyayê di mijara zimanê îşaretan da ne xwedî agahî ne û di bernameyên ji bo kerr û lalan da, ne xwedî tecrûbe ne. Ji ber vê, pir caran di kanalên da mirovên ku di derheqê ZAK û pêdivî û pêwendiyên kerr û lalan da ne xwedî agahî ne dixebitînin. Ji van û ji

çend belgefilmên di derheqê kerr û laliyê da peve ji bo civaka kerr û lalan tu  
bernameyên TVyan tine ne.



## BEŞA SÊYEM

### 3. RÊZIMANA ZIMANÊ ÎŞARETAN

#### 3.1. Morfolojî

Morfolojî (morphology), zanista vekolana pêkhatin û sazûna bêjeyan e. Heke mirov bi awayekî din bibêje, “morfoloji zanista avahîsaziya bêjeyan e. Peyv ji morfeman pêk tê angî morfeşan yekeya herî biçûk a watedar e.” (Berbang, 2008).

Di derheqê morfolojîya ZAK da agahî pir kêş in. Heta niha tu zimannasên HKÎ li ser ZAK nexebitîne. Yêş ku xebitîne jî giştî endazyar in û li ser bernameyên danasîna ZAK ya li ser platforma dijîtal xebitîne. Heta niha tenê li HKÎ dihate zanîn, li perçeyên din haya tu kesî jê tine bû yan jî guh nedanê. Ji ber ku akademî û zimannasên dilsoz bi taybetî bala xwe dane ser zimanê axaftinê. Mafdar in ku sedema herî mezin “xetereya zimanê axaftinê ya li ber tinebûnê” bû. Lewra agahiyên me pir kêş in.

Di ZAK da jî *morfeşên girêdayî yêş dariştinê* tên dîtin. Mînak, hejmarên mîna Yek, Du, Sê ne xwedî livandin in, tenê xwedî şiklê dest in. Dema ku bi herdu alîyan va hinek bêş livandin/hejandin, dibine Deh, Bîst, Sî, îşaretên nû tên çêkirin.



2

20

Şekil 11: Çêkirina Ji Îşareta 2, Îşareta 20

Di ZAK da morfemên girêdayî yên kêşanê jî tên dîtin. Minak, ji bo pirjimariyê livandina dest li îşaretê tê zêdekirin, yanî îşaret carek du carê din tê dubarekirin. Ji bo peyva Pît (tîp) dest carek ji ber dev ber bi jêr va dilive, dema çend carên din bilive dibe pirjimar yanî îşareta Pîtekan (pirjimara tîpan, tê wateya elfabeyê jî).



**Şekil 12: Îşareta Pît/Tîp (Yekjimar)**


Dema livandina ji ber dev ber bi jêr va dubare dibe, wateya pirjimariyê lê zêde dibe, dibe Pîtekan.



**Şekil 13: Îşareta Pîtekan (Pirjimar)**

Di ZAK da morfemên xweser yên ferhengî jî tên dîtin. Mînak, di îşareta SERPERIŞTYAR (bi kurmancî serperişt) da ji bo navê meslek/pîşe çêbikin pêşî îşareta SERPERIŞT (yanî navê karê kontrolê) paşî îşareta ÎŞ tê çêkirin. Lewra îşareta ÎŞ îşareteke xweser bi wateye, dikarin bi tenê jî bi kar bînin. Dema ku ji herdu îşaretan

darîştinek pêk tê dibe SERPERIŞT+YAR (mirovê ku karê kontrolê dike angî mesleka kontrolkirinê).




**Şekil 14: Çêkirina Îşareta Serperîştyar (Serperîşt+Pîşe=Serperîşt)**

Îşareta li jêr jî pir tê bikaranîn. Ji bo navê mirovên ku xwedî wê pîşeyê nîşan bide, pêşî ev îşaret (Mirov) tê çêkirin, paşî îşareta wî karî tê çêkirin. Ji bo îşareta Wezîr pêşî ev îşaret tê çêkirin paşî îşareta wezaretê tê çêkirin.



**Şekil 15: Çêkirina Îşareta Wezîr**

Ev îşareta li jor pir tê bikaranîn. Bi giştî pêşî îşareta mirov tê. Pir hindik caran îşareta mirov piştî îşareta kar/pîşe tê. Di mînakê îşareta Paşa da pêşî paşatî, paşî mirov hatiye.



**Şekil 16: Çêkirina Îşareta Paşa**

Me morfemên xweser yên rêzimanî tesbît nekir. Lewra di her Zîyan da nayên dîtîn. Dibe ku hebe, lê ji bo tesbîtkirinê lêkolînên berfireh divê.

Di hin Zîyan da dubarekirin (*reduplication*) jî hêmaneke morfolojiyê ya giring e. Di ZAK da dubarekirin ji bo îşaretên nû çêkin yan jî ji bo kêşanê tê bikaranîn. Li jor, di mînaka Pît û Pîtekan da me dît ku livandina dest dema dubare dibe wateya pirjimariyê dide. Ev mînak ji bo kêşanê mînak e. Ji bo çêkirina îşaretên nû mînak, di îşareta Do da dest bi paşîya serî va carek tenê dilive, di îşareta Pêr da dest bi paşîya serî va du cara dilive. Yanî dubarekirina livandinê wate guherandiye.



DO

PÊR

**Şekil 17: Îşaretên Do û Pêr**

Di zimanê îşaretan da hevedudanî jî hêmaneke girîng yê morfolojîyê ye. Mînak, ji bo îşareta Rawêjkar (şewirmend), pêşî îşareta “Axaftin”ê paşî îşareta “Pîrsnîşan”ê tê çêkirin. Ji herdu îşaretan îşareta Rawêjkar (Axaftin + Pîrsnîşan = Rawêjkar) pêk tê.



**Şekil 18: Îşareta Hevedudanî Rawêjkar**

### 3.2. Fonetîk

Hêmanên bingehîn yê nav avahiya fonolojîk weki “şiklê dest (*handshape*), cih (*location*), livandin (*movement*), berîdan (*orientation*) û livandinên ji xeynê dest” di ZAK da jî hatine qebûlkin.

### 3.2.1. Şiklê dest (*Handshape*)

Şiklê dest, îşareta bingehîn tê qebûlîkirin. Ji ber ku ZAK û American Sign Language (ASL) ji pir aliyan dişibine hev, bi piranî ASL û ZAK tîn berawirdîkirin, yanî mînak bi piranî ji ASL tîn dayin. Li gor Wilcox (2007, s. 1114) şiklê dest, konfigûrasyona dest e ku dema îşaret tê çêkirin. Li gorî Sutton-Spence & Woll (1999, s.6) û Schirmer (2001, s. 6), pêkan e ku şiklên dest yê cuda yê fîzîkî hebin. Di her Zîyan da ji bo pêkanîna îşaretan şiklê dest bi kar tînin ku ev jî sînordar in. Şiklê dest ya T ya di ASL da heye, di Zîyên Ewropî da tineye. Di Zîyên tîn zanîn da hin şiklên dest hevpar in, lê di çend Zîyan da hê jî hin şiklên dest yê marjînal hene. “Destnîşankerên yunanî, şiklê dest yê dest girtî, tiliya qîlîçê û tiliya gustîlkê dirêjkirî bi kar naynin. Di ASL da, şiklê dest yê dest girtî û tiliya navîn dirêjkirî tineye.” (Brentari & Eccarius, 2010, s. 284).

Hin zimannasan, li ser hin mijaran hûr dibin ku ev jî çarçoveya mijarê firehtir dîkin. Emmorey (2002, s.33) û Johnston & Schembri (2007, s.79) çarçovê hinek din fireh dîkin, dibêjin, li gorî hejmara tiliyên hilbijartî yan jî dirêjkirin û tewandina tiliyên hilbijartî pir konfigûrasyonên cuda yê wekî çengel yan tewandî hene. Dikarin dest mîna kulm bigirin yan tiliyan vekin yan jî tiliyan bigihînin hev. Dikarin zendan bitewînin yan movikên tiliyan bi tewînin. Dikarin tiliya beranekê dirêj bikin, bi tiliyên din ra hevrast bigirin, li ser kefa dest yan li ser kulm bigirin. Tiliyên nîşandanê, navîn, gustîrkê û qîlîçê jî dikarin dirêj bikin, bitewînin yan jî bi hev ve kin. Avahiya fonolojîk ya şiklê dest movik (*joints*) in û tiliyên hilbijarti (*selected fingers*) ne.

**Tablo 3: Avahiya Fonolojîk Ya Şiklê Dest**



Dikarin movikan kom bikin, vekin, bitewînin û bigirin. Tiliyên hilbijartî li hin deverên laş temas dikin. Hejmara tiliyan bi quantity (hejmar) tê îfadekirin û xalên referansê ulnar (tiliya qiliçê) û nîv (tiliya gustîrkê) in. Mînak: Di ZAK da îşareta Nav û Cînav (pronoun) ji aliyê hejmara tiliyên hilbijartî va cuda ne.




**Şekil 19: Di ZAK Da Îşareta Nav (name)**

Dî îşareta Nav da tiliyek (tiliya eşhedê) tenê, di îşareta Cînav da 2 tilî (tiliya eşhedê û tiliya navîn) tî hilbijartin.



**Şekil 20: Di ZAK Da Îşareta Cînav (pronoun)**


Di îşaretên Nav û Cînav da hejmara tiliyan guheriye û wate jî guheriye. Tenê tiliyek yan du tilî vekirî ne, ji xeynî wan tiliyên din girtî ne. Mîna van, di îşareta Asayîş da tiliya hîlbijartî guheriye, tiliya beranekê hîlbijartî ye û li sing temas dike, tiliyên din jî vekirî ne.



**Şekil 21: Di ZAK Da Îşareta Asayîş**

Li van her sê îşaretan tê dîtin ku ji aliyê hejmara tiliyên hilbijartî ji hev cuda ne. Dema hejmara tiliyên hilbijartî diguhere (Nav: tiliyek, Cînav: 2 tilî) şiklê dest jî diguhere û wate jî bi xwe ra diguherîne. Yan jî dema tiliya hilbijartî diguhere (Asayîş: tiliya beranekê) dîsa şiklê dest diguhere. Ji bo zelalkirina mijara beşa 1.a. ya “Di fonolojiya zimanê îşaretan da dabeşkirina taybetmendiyên îşaretên bidestkî” ev her sê mînak wê têrker bin. Emê derbasî beşên din bin.

Mînak: Di şiklê dest yê ف da movikên tiliyan hemû kombûyî ne, di şiklê dest yê ه da hemû tilî vekirî ne. Ji bo mijara beşa 1.b. ya “Di fonolojiya zimanê îşaretan da dabeşkirina taybetmendiyên îşaretên bidestkî” bê famkirin wêneyê li jêr wê têrker be.



ف



ه

### Şekil 22: Movikên Tiliyan Kombûyî û Vekirî

Di mînaka ب da tenê tiliya eşhedê teşe girtiye, di şiklê ج da hemû tilî teşe girtine. Di van mînakan da ev şiklên dest nediyar in. Yanî wateya wan di nav hevokê (rêza îşaretan) da diyar dibe. Lewra tînen wateyên din. Îşareta ج di heman demê da tê wateya kîvroşkê jî. Ev mînak Ji bo mijara beşa 1.c. bê têgihiştin wê têr bike.



ق



ب

### Şekil 23: Şiklên Dest Yên Ne Diyar: Teşegirtina Tiliya Eşedê Yan Jî Hemû Tiliyan

Di mînaka Zêr da tiliyên eşedê û beranekê hilbijartî ne û teşegirtî ne. Ev şiklê dest şikleke diyar e ku wateya wê yek e. Ev mînak Ji bo mijara beşa 1.d. bê têgihiştin wê têr bike.



### Şekil 24: Ji Bo Şiklên Dest Yên Diyar: Teşegirtina Tiliyên Hilbijartî (Îşareta Zêr)

Temaskirina tiliyên hilbijartî jî wate diguherînin. Mînak: Di ZAK da îşareta Hesp û îşareta Ker bi temamî wekhev in. Tenê di îşareta hesp da tiliya berankî, dema îşareta guh çêdike, li serî temas dike.




**Şekil 25: Di ZAK Da Îşareta Ker**

Di navbera herdu îşaretan da tenê temaskirina tiliya beranekî ya li serî cuda ye.



**Şekil 26: Di ZAK Da Îşareta Hesp**

ASL, elfabeya bidestkî ya bi destekî bi kar tîne. Destnîşanker destê rastê jî bi kar bîne yê çepê jî bi kar bîne, destê wî yê sereke kilît artîkulator e. “Îşaretên ne-bidestkî, hem bi îşaretên bidestkî hem yên ne-bidestkî ra tînin bikaranîn û pir-fonksîyonî ne. Û ji aliyê cureyên hevokan, hevokên neyînî, hevokên pirsyarî va di rêziman da xwedî roleke pir girin in.” (Tennant & Brown, 1998, ss. 26-8; Rambhau, 2013, ss.1-2).



**Şekil 27: Elfabeya Tiliyan Ya ASL Ya Bi Destekî**


Hejmarên ASL jî bi destekî tên çêkirin.



**Şekil 28: Hejmarên ASL**


Rola tevgera şiklê dest, di avahiya fonetîk ya şiklan da pir mezin e. Wekî Zîyên din di ZAK da jî şiklê dest yê bingehîn (basic or neutral handshape), navendî (central) û marjînal heye. “Di nav şiklên dest da yên ku herî zêde tên dîtin, şiklên dest yên

bingehîn in. Yê ku ji aliyê zarokan va herî zêde tên bikaranîn, dibe ku di hemu Zîyan da jî bê dîtin. Mînak: ئ، ه، ش، س، ك، ب، د، آ” (Pirot & Ali, 2022).



**Şekil 29: Şiklên Dest Yê Bingehîn Yê Di ZAK Da Herî Zêde Tê Bikaranîn**


Di ASL da şiklên dest yê C û O pir tên dîtin, me jî van şiklên jor mînak da. Ji bilî van, hin şiklên ku di ASL da tine ne di ZAK da hene. Mînak: ه، ئ، چ، پ، ژ، غ، ع، ل، و، و، ئ، پ. Lewra ZAK û ASL elfabeyên cuda bi kar tînin.



**Şekil 30: Şiklên Dest Yê Ku Di ZAK Da Hene Lê Di ASL Da Tine Ne**

Şiklên dest yê navendî (*central handshape*) di ZAK da xwedî roleke pir giring in, lewra gelek îşaret bi van şiklan tî marjînal. Di van da çend cure varyasyon hene. Ev şiklên dest, hin şiklên dest yê navendî pêk tînin. Mînak: , ف , گ , ب , آ (bnr. elfabeya tiliyan ya ZAK, Şekil 31). Şiklên dest yê arjî ZAK da hene, jî arjî tev li gorî elfabeyê ne, di ASL da tine ne. Lewra herdu jî elfabeyên cuda bi kar tînin.

Şiklên ku bi rêya şibandinê (*iconic*) tî çêkirin marjînal in. Ev cure îşaret jî pir kêmjimar tî çêkirin. Ev îşaret jî jî arjî mirovên ne kerr tî famkirin. Mînak: , ا , د , ر , ه . Elfabeya tiliyan (*fingerspelling*) jî wekî şiklê dest şikleke marjînal e. Ji agahiyên ku me jî ferhenga kerr û lalan, jî mamosteyên Hîwayê, jî saziyên taybet yê kerr û lalan û jî hin aktîvîstan wergirt, diyar e ku 36 tîpên elfabeya destan ya ZAK heye.




**Şekil 31: Elfabeya Tiliyan Ya ZAK**

Şiklê dest yê Zîyan, wekî fonemên zimanê axaftinê tî qebûlkin. Çawa di ASL da heye, di ZAK da jî heye ku şiklê dest jî taybetmendiyên bêemsal pêk tînin. Mînak: tam (çar tilê wekî ش , س , dirêjkirî), çeprast (çeprastkirina tiliyan) ت , م , ز , ژ , temas

(temaskirina serê tiliyan û tiliya beranî) ٥ ، ف، ه ، ج، ق، ٥ . Ji bilî wateya fonemî hin wateyên din yên şiklê destan hene. Ji bo wateya mirovan, ajalan, piçûk û glover, mezin û glover hwd nîşan bidin, dibine hêmanên dabeşker. Ji bo îsnadkirina beşên navan, di hemû Zîyan da şiklê dest tê bikaranîn û di ZAK da jî wisa ye. Mînak: tîpa ح mîna mar e û tîpa ج mîna kîvroşkê ye. Ji bo herduyan jî heman îşaret tê bikaranîn.

Wekî ASL, di ZAK da jî her tîp bi îşaretek tê nîşandan. Lê tê dîtîn ku hin tîp hene ku ji yekê zêdetir guhertoyên wan hene. Di ZAK da berê dest, ji bo avakirina îşaretan xwedî roleke pir giring e. “Pêşîbûna hereketan, wateya îşaretan ya lexical û avahiya rêzimanî ji bo îfade bike li valahiya îşaretan ji aliyê dest û tiliyan tê pêkanîn” (Dictionary, 2000).

Hejmarên ZAK, wekî elfabeya tiliyan, di nivîsê da kîjan pergala hejmaran bi kar tînin, ji ber wan hatine çêkirin. ZAK ji ber hejmarên erebî hejmarên xwe çêkiriye.



**Şekil 32: Hejmarên ZAK**


Bikaranîna elfabeyê pir ne berbelav e. Kerrên ku li dibistanê perwerde nedîtibin, elfabeyê jî pi bi kar naynin û di ragihandina rojane da pir pêdiviya wan jî pê nabe. Lê ev nayê wê wateyê ku ne pêwîst e. Dema pêdivî çêbû ku hin îşaretên ku di ZAK da tine ne yan jî peyvên serenav wê bikar bînin, divê bi elfabeyê nîşan bidin. Kerrên ku

neçûne dibistanê jî elfabeya erebî zanin, lewra di karûbarên rojane da li her deverî nivîs (tabela û hwd.) hene û bi van, jiyana xwe didomînin. Ji bilî vê, îro dem dema teknolojiyê ye û hema hema di destê hemû kerr û lalan da telefon hene û bi taybetî ragihandina xwe bi rêya platformên wek whatsappê bi lêgerîna bidîmen (video call) dikin. Ji bo vê jî elfabe pir bikêr tê, heta elfabeya latînî pirtir bi kêr tê.

Gelo elfabeya destan ji bo ragihandina li ser kaxiz pratîke yan na? Belê, li Hewlêrê, mamosteyê kurd Îzzeddîn Hamîd Mustafa, 2024an da, li dinyayê yekem car, Qur'ana Pîroz bi elfabeya zimanê îşaretan (ZAK) nivîsî (Anadolu Ajansı, 2024). Ev xebat nîşan dide ku elfabe her çiqas ne berbelav be jî, bi saya wê, mirovên kerr u lal dê bikaribin Qur'ana Pîroz bixwînin. Dibe ku di siberojê da gelek pirtûkên din bên nivîsîn.

### 3.2.2. Cih (Location)


Hêmanê duyemîn ya avahiya dengnasiyê (*phonological*) cih e. Li gorî Taub (2004, s.27) û Wilcox (2007, s.1115), devera ku îşaret lê çêdibe, cih e. Îşaret li gorî cîyê ku lê tên çêkirin cuda dibin. Dibe ku li ser laş, cîyekî sabit be jî. Şekil 33, Di ASL da du îşaretên ku cîyê wan cuda ne nîşan dide.



**Şekil 33: Du Îşaretên ASL Ku Cîyên Wan Cuda Ne: a) Havin, b) Germ**

Cîyê temasê li gorî nêzîkbûn û dûrbûna ji laş va diguherin. Li gorî Johnston & Schembri (2007) cûreyên temasên îşaretê dido ne: îşaretên li ser laş û yên li ser destan. Ji cîyên li ser laş ra cîyên bingehîn (*primary locations*), ji yên li ser destan ra cîyên talî (*secondary locations*) tên gotin. Piraniya îşaretan di herêma destnîşanê (*signing space*) da hatine çêkirin: firehiyeke ji ser serî heta noqê û dema milan ditewînin ji enîşkê heta

enîşkê ye. Di wêneyê li jêr (Quer, 2017, s. 29) da cîyên destnîşanê angî herêma destnîşanê hatiye nîşandan.



**Şekil 34: Cîyên Destnîşanê (Location)**

Di ZAK da jî hin îşaret li ser laş hin îşaret li ser destan çêdibin û hin îşaret jî di valahiya destnîşanê (valahiya destnîşanê, yanî di çêkirina îşaretê da li laş û dest temas nabe) da çêdibin. Di mînaka *Evînê* da cîyê îşaretê li ser laş e, li ser singê ye, yanî cîyê îşaretê cîyê bingehîn (*primary location*) e.




**Şekil 35: Di ZAK Da Cîyê Bingehîn (Primary Location) , Îşareta Evîn**

Di îşareta Hikûmet da cîyê îşaretê li ser sermil e, yanî li ser laş e, yanî cîyê îşaretê cîyekî bingehîn e.



**Şekil 36: Di ZAK Da Cîyê Bingehîn, Îşareta Hikûmet**

Di mînaka Xwe Şûştin da cîyê îşaretê li ser mil e, yanî li ser laş e, tenê bi destekî ye. Cîyê îşaretê cîyê bingehîn e.



**Şekil 37: Di ZAK Da Cîyê Bingehîn, Îşareta Xwe Şûştin**

Di mînaka Sabûn da cîyê îşaretê ser dest e, destê sereke pêşî li ser kefa destê nesereke dikeve û paşî li ser piştê dest livandina fîrkandinê dike. Yanî cîyê talî ye.




**Şekil 38: Di ZAK Da Cîyê Talî (Secondary Location), Îşareta Sabûn**

Di mînaka Heval da cîyê îşaretê li ser destan e, herdu dest li ser hev in û bi hev digirin, destê sereke li ser e, yanî cîyê îşaretê cîyê talî (*secondary location*) ye.



**Şekil 39: Di ZAK Da Cîyê Talî, Îşareta Heval**

Di mînaka îşareta Firçe da destê nesereke kulm e û tiliya eşedê dirêkirî ye. Destê sereke li ser tiliya destê nesereke ye. Yanî cîyê îşaretê talî ye.



**Şekil 40: Di ZAK Da Cîyê Talî, Îşareta Firçe**

Di mînaka Nefretkirin da, îşaret ji laş dûr e lê ne li ser laş e jî. Cîyê îşaretê valahiya destnîşanê (*signing space*) ye.



**Şekil 41: Di ZAK Da Valahiya Destnîşanê (Signing Space), Îşareta Nefretkirin**

Di mînaka Balafir da dest li valahiya destnîşanê da ber bi jor va diçe, şiklê dest neguhere.



**Şekil 42: Di ZAK Da Valahiya Destnîşanê, Îşareta Balafir**

Cih ji aliyê rêziman va ji bo tîkiliyên demkî tê bikaranîn. Li gorî Sutton-Spence & Woll (1999, s.7) û McGregor (2015, s. 287) di nîşandana îşaretan da û bikaranîna tîkiliyên demkî da û dîyarkirina avahiya rêzimanî da xwedî gringiyêke taybet e.

Mînak: Nîşandana Do (Dwënë) û Îro (Amro) ji aliyê cih ve ji hev cuda ne. Tiliya eşedê ya destê domînant (dominant hand) ango destê sereke, di îşareta Amro da du cara ber bi jêr tê livandin, di îşareta Dwënë da destê domînant, ji bo rabirdûyê îşaret bike, ber bi paşîya serî va tê livandin. Di ZAK da bi navê cîyên bingehîn û cîyên talî du cure cih hene.



**Şekil 43: Berê Îşaretan Di ZAK Da, Îşaretên Do û Îro**

Ji bo îşaretên demê bi giştî 3 cih tên bikaranîn. Wekî mînaka do da berê paşîya serî, wekî mînaka îro da pêşîya destnîşanker û ber bi jêr va, yan jî li pêşîya destnîşanker ber bi herdu aliyên va. Emê niha cîyên îşaretên bi deman ra têkildar nîşan bidin.

Di mînaka do da dest dîçe ber bi paşîya serî va û di hemû mînakên bi rabirdû va têkildar da cih heman dever e. Di mînaka Do da dibe ku dest girtî bi şiklê kulm be û tenê tiliya beranekî vekirî be. Jixwe di hin îşaretan da ji yekê zêdetir guherto hene.



**Şekil 44: Cîyê Destnîşanê Ber Bi Paşiya Serî Va, Îşareta Do**

Herwiha di mînaka Pêr da dîsa cîyê nîşandanê ber bi paşiya serî va ye û dest girtî ye, yanî kulm e û tenê tiliya beranekî vekirî ye. Lêbelê du cara ber bi paşiya serî va dilive.



**Şekil 45: Cîyê Destnîşanê Ber Bi Paşiya Serî Va, Îşareta Pêr**

Di mînaka Rabirdû da dîsa cîyê nîşandana îşaretê ber bi paşiya serî va ye û dest bi temamî vekirî ye.



**Şekil 46: Cîyê Destnîşanê Ber Bi Paşîya Serî Va, Îşareta Rabirdû**

Ji bo demên borî nîşan bidin, bi giştî cih ber bi paşîya serî va ye. Ku mirov ji xeynî van deman demên din bixwaze nîşan bide, wê pêşî îşareta demê çêke û paşî îşareta dema borî wê çêke. Me di beşa morfolojîyê da mînakên Meha Borî û Meha Bê dabû. Ji bo îşareta Dereng destê nesereke sabit e û berê wê li jêr e. Destê sereke di pozîsyona xwezayî (*neutral*) da ye û li ser destê nesereke ye, ber bi aliyê destê sereke va bi livandineke nîvçape (*radial*) dilive lê berê livandinê sankî bi paş va ye, lê cih pêşîya laşê destnîşanker e.




**Şekil 47: Cîyê Destnîşanê Ber Laşê Destnîşaker, Îşareta Dereng**

Di mînaka îşareta Êvar da herdu dest vekirî û ber bi serî va ne, wekî bi paşîya serî va biçin xuya dike lê wateya dema borî nade. Tiliyên herdu destan wekî ku bawêşînê bikin dilivin.



**Şekil 48: Cîyê Destnîşanê Ber Bi Serî Va, Îşareta Êvar**

Ji bo îşaretên dema bê bi giştî cih, pêşîya destnîşanker e û bi piranî ber bi jêr e. Di mînaka Nîvro da destê sereke li pêşîya laşê destnîşanker e, di pozîsyona neutral da ye û ji xeynî tiliya gutîrkê û tiliya qilîçê hemû tilî vekirî ne. Ber bi jêr va carek dilive. Cîyê îşaretên nîvro û îro heman dever e, tenê şiklê dest diguhere. Îşaretên bi dema niha ra têkildarin bi giştî li pêşîya destnîşanker çêdibin û berê wan bi jêr va ye. Pêşî îşareta demê çêdikin, paşî îşareta dema niha çêdikin.



**Şekil 49: Cîyê Destnîşanê Ber Laşê Destnîşaker, Îşareta Nîvro**

Îşaretên tenê wateya demê didin, mîna Nîvro ku ne wateya rabirdû ne wateya siberrojê didin, yê ji aliyê demê va notr (*neutral*) in, bi giştî li pêşiya laşê destnîşanker in. Îşareta Beyanî li pêşiya destnîşanker çêdibe û destê sereke ber bi jor va dilive.



**Şekil 50: Cîyê Destnîşanê Ber Laşê Destnîşaker, Îşareta Beyanî**

Di mînaka Şev da herdu dest sîmetrîk dilivin. Cîyê îşaretê ber laşê destnîşanker e. Berê livandinê bi awayê kevane, ber bi jêr e. Berovaciyê vê îşaretê, yanî ji hundir ber bi derva, tê wateya Rojê.




**Şekil 51: Cîyê Destnîşanê Ber Laşê Destnîşaker, Îşareta Şev**

Di mînaka Hertim da, destê sereke li pêşiyê sê cara bi aliyê destê nesereke va dilive. Wekî ku li pêşiya laşê destnîşanker xalên demê hebin û lêxe.



**Şekil 52: Cîyê Destnîşanê Ber Laşê Destnîşaker, Îşareta Hertim**

Îşaretên bi dema bê va têkildar in, cîyê wan pêşiya destnîşanker e. Cudatiya dema niha û dema bê, tenê berê livandinê ye. Di dema bê da berê livandinê bi herdu aliyên va ye yan jî bi pêş va ye. Di mînaka Dahatû da destê sereke girtiye û tenê tiliya eşedê dirêjkirî ye. Li pêşiya destnîşanker livandineke bi şiklê kevane dilive ber bi aliyê din va.



**Şekil 53: Cîyê Destnîşanê Ber Laşê Destnîşaker, Îşareta Dahatû**

Di ZAK da hin îşaret hene ku ji yekê zêdetir guhertoyên wan hene. Herwiha hin îşaret hene ku ji yekê zêdetir wateyên wan hene. Çawa ku li jor me dît ku du guhertoyên îşareta Do hebûn, îşareta Dahatû jî hem ji bo wateya Dahatû hem ji bo wateya Sîberoj, Sîbê jî tê bikaranîn. Lêbelê di mînaka Dotir da hemû îşaret wekhev e, tenê hejmara tiliyên hilbijartî diguhere. Tiliya eşedê û gustîrkê dirêjkirî ye. Di heman demê da ev îşaret tê wateya Duşemê jî.




**Şekil 54: Cîyê Destnîşanê Ber Li Laşê Destnîşaker, Îşareta Dotir/Duşem**

Di mînaka Esir da destê sereke pêşî li ser zenda destê nesereke temas dike û paşî çar tilî vekirî nîşan dide. Cîyê îşaretê pêşiya destnîşanker e, lê livandin cji demên din cuda ye.



**Şekil 55: Cîyê Destnîşanê Li Ber Laşê Destnîşaker, Îşareta Esir**

Îşaret bi giştî di nav herêma destnîşanê da tîn nîşandan. Herêma destnîşanê ya ZAK mîna Zîyên din ji ser serî heta noq e. “Mînak: Ji bo nîşandana Cemedan (*Camadânî*) ji ser serî, ji bo nîşandana Kîvroşk (*Karwêşk*) heta noq e.” (Dictionary, 2000).



**Şekil 56: Herêma Destnîşana ZAK, Îşaretên Cemedan û Kîvroşk**

Di mînaka îşareta Laş da herêma îşaretê ji serî dest pê dike û ji noqê hinek desrbas dibe.




**Şekil 57: Herêma Destnîşana ZAK, Îşareta Laş**

Di mînaka îşareta TV da, mil tewandî ne û sînore herêma destnîşanê ji enîşkê heta enîşkê ye.



**Şekil 58: Herêma Destnîşanê Ji Enîşkê Heta Enîşkê, Îşareta TV**

Di îşareta Baxçevan da, di wêneyê nivî da xuya dike ku îşaret dema dest vekirî be di navbera herdu destan da, ji enîşkê heta enîşkê û bi herdu aliya va ye. Lêbelê li gorî destnîşanker dibe ku ji sînore enîşkan hinek derbas bibe.



Şekil 59: Herêma Destnîşanê Ji Enîşkê Heta Enîşkê, Îşareta Baxçevan

Carcaran hin îşaret ji sînore herêma destnîşanê hinek derbas dibin. Bi taybetî îşaretên cil û bergan carinan ji sînore derbas dibin. Mînak: Di îşareta Şal (pantolon) da, wekî ku di wêneya li jêr da jî tê dîtin, herdu dest ji sînore herêma destnîşanê ber bi jêr va derbas dibin. Lê ev îşaret pir kêmtir in.



**Şekil 60: Sînore Herêma Destnîşanê Hinek Derbas Bûye, Îşareta Şal/Pantolon**

Yek ji van îşaretan Etek e. Dîsa cureyeke cil û bergan e. Îşaretên cil û bergan bi piranî îkonîk in, yanî bi şibandinê tên çêkirin. Di îşareta etek da jî dest û livandina destan dişibine etekê jinan. Û ev îşaret jî ji sînore destnîşanê derbas dibe.



**Şekil 61: Sînorê Herêma Destnîşanê Hinek Derbas Bûye, Îşareta Etek**

Yek ji wan îşaretan Gore ye. Mirov ji bo gore têxe piyan divê xwe bitewîne, dema îşaretê çêdikin ji bo ji sînorê destnîşanê dernekevin, yanî ji bo temasa çav/dîtinî qut nebe, xwe natewînin. Yanî tenê destpêka xwetewandinê nîşan didin û ev ji bo bê famkirin têrker e. Lêbelê dest ber bi jêr va, piçek ji sînorê destnîşanê derdikevin.




**Şekil 62: Sînorê Herêma Destnîşanê Hinek Derbas Bûye, Îşareta Gore**

Herî zêde di mînaka Çok da xwe ditewînin û çokê nîşan didin.



**Şekil 63: Ji Herêma Destnîşanê Zêde Derbas Bûye, Îşareta Çok**

Herêma destnîşana ZAK ji ser serî heta noq e, lêbelê pêşiya laş e. Ji ber ku ragihandin di çarçoveya dîtina çav da ye, ji bo ragihandin qut nebe ango bêkêmasî pêk were, divê pêşiya laş bê bikaranîn. Lêbelê di îşareta كمو/Kewa/Eba (cureyeke cil û bergên jinan e, mîna êlekê xemilandî ye) da tişteki spesîfik diqewime. Destê destnîşanker diçe piştê laş. Dest li piştê, di hîzaya gurçikan, li piştê temas dike. Ev taybetî tişteki nedîtî ye, di Zîyan da pir nayê dît. Lê me jî tenê di îşaretên bi cil û bergan ra têkildar da dît. Yan na destnîşanker ji herêma destnîşanê zû bi zû dernakevin.



**Şekil 64: Ji Sînore Kanala Dîtbarî Derbas Bûye, Îşareta Kewa/Êlek**

Di mînaka Pişt da ji bo ji herêma destnîşanê dernekevin îşaretek nû çêkirine. Lewra mirov nikare bi destan pişt xwe nîşan bide, ango destê mirov nagihe pişt xwe.



**Şekil 65: Herêma Destnîşana ZAK Da, Îşareta Pişt**

Di îşareta Pê da, dêvla ku xwe bitewînin û pê nîşan bidin, bi destan û di herêma destnîşanê da nîşan didin.




**Şekil 66: Îşareteke Li Valahiya Destnîşanê, Îşareta Pê**

Di mînaka îşareta Panî da, ji bo ji herêma destnîşanê dernekevin, îşaret li valahiya destnîşanê û bi herdu destan tê çêkirin.




**Şekil 67: Îşareteke Li Valahiya Destnîşanê, Îşareta Panî**

Di mînaka Futbol (topa piyan) da, ji bo ji herêma destnîşanê dernekevin îşaretê bi destan nîşan didin. Destê nesereke sabît e û destê sereke di dêvla piyan da wekî ku li topê bixe dilive û li destê din dixe.



**Şekil 68: Îşareteke Li Valahiya Destnîşanê, Îşareta Futbol**

Di mînaka Çavgirtîkê da mil didin ber çav. Belê divê ji herêma destnîşanê dernekevin û temasa çav/dîtinê divê qut nebe, lê ji bo hin îşaretan mil dibe ku were ber çav. Lêbelê ev ragihandinê qut nake, lewra yê ku îşaretê çêdike ber çavê xwe digire, yê din dibîne. Ev îşaret bêkîte ye.



**Şekil 69: Di Herêma Destnîşanê Da Mil Dikeve Ber Çav, Îşareta Çavgirtîkê**

### **3.2.3. Livandin (Movement)**

Livandin jî hêmaneke giring yê îşaretan e ku dema îşaretan pêk tînin bi piranî pêdivî bi livandinê çêdibe û kombîasyonên livandinê îşaretên nû pêk tîne. Li gorî Wilcox (2007, s. 1115), dema destnîşankerê Kerr îşaretê çêdike, hereketên ku dike, livandin (movement) e. Johnston & Schembri (2007, s. 80) û Takkinen (2008, s. 101) livandinê, di nav her sisêyan da parametreyê herî kompleks qebûl dikin. Hem şiklê dest, hem berê kefa dest û tiliyan dikare bi guhere. Îşaretan, bi hereketên sade (*simple*) yan jî bi kombîasyonên kompleks yê hereketên cuda pênasê dikin. Hemû livandinên fîzîkî yê pêkan yê tiliyan da, destan û milan bi kar tînin.

Mînak: Di îşareta Baş da, livandineke hêsan (*simple*) heye. Şiklê dest kulm e, dest tenê ji jor ber bi jêr va carek dilive.




**Şekil 70: Livandina Hêsan (simple movement ), Îşareta Baş**

Mînak: Di îşareta Covid da livandineke kompleks heye. Şiklê destê sereke pêşî kulm e û li ser destê nesereke ye, paşî destê sereke vedibe û livandineke kevane dike.



**Şekil 71: Livandineke kompleks, Îşareta Covid**

Îşaretên Sisê û Sêyem ji hemû aliyan va wekhev in, lê tenê parametreya livandinê diguhere. Di mînakê îşareta Sisê da şiklê dest ji xeynî tiliya qiliçê û gustîrkê vekirî ye. Dest li ber destnîşanker bêlivandin tê nîşandan û bêkîte ye, yanî livandineke hêsan e.



**Şekil 72: Livandineke Hêsan, Îşareta Sisê**

Lê di mînaka îşareta Sêyem da hemû parametreyên dest wekhev in lê tenê dest bi aliyê destê nesereke va dilive. Yanî ji dû kîteyan pêk tê, yanî livandineke kompleks e. Ev ji bo hejmarên din jî derbasdar e.



**Şekil 73: Livandineke Kompleks, Îşareta Sêyem**

Livandin du cure ne: sereke (*primary*) û talî (*secondary*). Livandinên sereke (*primary movements*), ew livandin in ku ji cîyekî heta cîyekî tên kirin: ber bi destnîşanker va yan ji wî dûr va; bi şiklê çemberekê yan spiralek; dema dest tên vekirin û girtin bi guherîna şiklê dest û berê dest ra livandina bi aliyê jêr û jor. Livandinên talî (*secondary movements*), guherînên şiklên dest, yan berê dest yê dubarebûyî ne. Di mînaka îşareta *Firkandinê* ya ASL da destê sereke li ser destê nesereke bi pêş û paş va diçe û tê.



**Şekil 74: Di ASL Da Livandina Talî, Îşareta Firkandinê (Rubbing)**

Hemû agahiyên li ber dest nîşan didin ku di ZAK da du cure livandin hene. Ji bo nîşandana livandinên hêsan (*simple*) û kompleks, berê destan, lepan û tiliyan tê guheradin. Ji van ra livandinên sereke (*primary movement*) û livandinên talî (*secondary movement*) tê gotin. Johnston & Schembri (2007, s. 80) û Wilcox (2007, s. 1115) dibêjin, mirov dikare hemû livandinên mil, dest û tiliyan bi kar bîne. Ev yek ji bo ZAK jî derbasdar e. Emê van livandinên sereke û livandinên talî û hemû cureyên van livandinan bi hûrgilî rave bikin. Herdu wêneyên li jêr ji ferhenga kerr û lalan hatiye wergirtin.



a) BÎŽÎ *well done*



b) LA XIZMAT DÂM *at your service*



c) BARDAWÂMÎ *continuous*



d) BÊ HEZ *weak*

### Şekil 75: Livandinên Sereke (Primary Movement) Ji Ferhengê

Tê dîtîn ku livandin çiqas mezin in. Qasî ku piçûk dibin, dibine talî.



a) LÛS *smooth*



b) ZBÎR *rough*

### Şekil 76: Livandinên Talî (secondary movement) Ji Ferhengê

Di mînakê îşareta Fîl da dest ji pozê destnîşanker , ber bi jê dûr va dilive û livandin dişibe xortoma fîl. Livandineke sereke ye.



**Şekil 77: Livandina Sereke, Ji Destnîşanker Dûr Va, Îşareta Fîl**

Di mînaka îşareta *Beraz* da destê nesereke li ber pozê destnîşanker e û glover sekiniye, destê sereke kulm e û du tiliyê dest vekirî ne. Destê sereke ber bi destnîşanker va dilive. Livandineke sereke ye û ber bi destnîşar va ye.



**Şekil 78: Livandina Ber Bi Destnîşanker Va, Îşareta Beraz**

Di mînaka *Trên* da destê nesereke vekirî ye û di pozîsyona normal (neutral) da ye û bûye zemîn ji destê sereke ra. Şiklê destê sereke kulm e û tiliya eşedê û ya navendê dirêjkirî ne. Destê sereke livandineke sereke dike û livandineke çember e.



**Şekil 79: Livandineke Sereke û Çember, Îşareta Trên**

Di mînaka *Bahoz (tornado)* da herdu dest kulm in û tenê tiliyên eşedê dirêjkirî ne. Serê tiliyan li hev dinêre û herdu tilî heman demê bi şiklê spîralê dizîvîrin û ji hev dûr dibin. Livandineke sereke û spîral e.



**Şekil 80: Livandineke Sereke û Spîral, Îşareta Bahoz**

Di mînaka îşareta *Revî Revî* (lîstikeke zarokan e, revî revî yan revî rovî) da destê sereke livandineke spîral dike ber bi aliyê din va. Lê spîral bi xwe jî cih diguherîne.



**Şekil 81: Livandineke Spîral, Îşareta Revî Revî**

Di mînaka îşareta *Tû* da, destê nesereke sabît e û destê sereke di binya destê nesereke da şiklê kulm e. Paşî ber bi jêr va dilive û vedibe, hemû tilî vedibin.



**Şekil 82: Livandineke Sereke û Dest Vedibe, Îşareta Tû**

Di mînaka îşareta *Bilez* da, dest pêşî vekiriye û paşî ber bi jor û pêş va bilez dilive tê girtin.



**Şekil 83: Livandineke Sereke û Dest Tê Girtin, Îşareta Bilez**

Di mînaka îşareta *Zor* da, herdu dest girtî ne, şiklê kulm in û ber bi jêr va dilivin.



**Şekil 84: Livandineke Sereke û Dest Girtî û Ber Bi Jêr Va, Îşareta Zor**

Di mînaka îşareta *Motorsiklêt* da, herdu dest girtî ne, şiklê kulm in û ber bi jor va dilivin.



**Şekil 85: Livandineke Sereke û Dest Girtî û Ber Bi Jor Va, Îşareta Motorsiklêt**

Di mînaka *SUV* (otomobil) da pêşî îşareta erebê tê çekirin û paşî dest vekirî ber bi jor va dilivin



**Şekil 86: Livandineke Sereke û Dest Vekirî û Ber Bi Jor Va, Îşareta SUV**

Di mînaka îşareta *Wezn* (*weight*) da dest vekirî yeû berê dest li jêr dinêre. Dest ber bi jêr û jor va dilive.



**Şekil 87: Livandineke Sereke û Dest Vekirî û Ber Bi Jêr Va, Îşareta Wezn**

Di îşareta *Mamoste* da destê nesereke vekirî ye û sabit e. Destê sereke kulm e û tenê tiliya eşedê dirêjkirî ye. Tiliya eşedê ya destê sereke du cara li nav lepê destê nesereke temas dike, yanî livandineke dubare ye, yanî livandineke talî ye.



**Şekil 88: Livandineke Talî, Îşareta Mamoste**

Hereketên/livandinên (*movement*) ZAK yên hatine dîtin dişibine zimanên îşaretan yên din. Yanî îşaretên ZAK hem rê hem livandinên hundirî nîşan didin. Hem îşaretên bi destekî (*one-handed*) hem îşaretên bi du destan (*two-handed*) di ZAK da pir tîr bikaranîn. Di îşaretên bi destekî da destê sereke dibe artîkulatorê aktîf (*active*

*articulator*), yanî destê ku îşaretê çêdike destê sereke ye. Di îşaretên bi du destan da bi piranî destê nesereke dibe artîkulatorê pasîf (*passive articulator*), yanî destê nesereke bi piranî dibe cîyê çêkirina îşaretê. Belê di hin îşaretan da herdu dest jî aktîfîn, lê bi piranî ev îşaret yên sîmetrîk in. Îşaretên sîmetrîk îşaretên mîna îşareta *ROJ û Şevê* ne.

### 3.2.4. Berê livandinê (*Orientation*)

Di hin îşaretan da berê livandinê wateya îşaretê diguherîne. Li gorî McGregor (2015, s. 284) berê livandinê, dema îşaret tê avakirin, berê kefa dest û tilyan yên cuda çep, rast, jêr, jor, ber bi destnîşanker va yan jî destnîşanker dûr va ye. Yanî bi her şeş aliyan va livandin dibe ku çêbe. Ev her şeş alî, delîlê sêberîbûna zimanê îşaretan e. Di wêneyê li jêr da analîza berê livandinê ya NGT bi hûrgilî hatiye kirin. Emê heman analîzê jî bo ZAK bikin.



**Şekil 89: Analîza Berê Livandinê Ya NGT**

Di wêneyê li jor da termên teknîkî bi îngilîzî ne. Me di beşa “Artikulasîyona Fonetik Yê Îşaretan” da van terman tevan bi kurdî rave kiriye. Emê di analîza li ser ZAK da hemû terman bi kurdî binivîsin. Emê îşaretên *Iraq û Nizanim* analîz bikin.



IRAQ



NIZANIM

|                                 | <u>IRAQ</u>                        | <u>NIZANIM</u>              |
|---------------------------------|------------------------------------|-----------------------------|
| <u>Berê movikbûnê</u>           | <u>notir</u>                       | <u>supine</u>               |
| <u>Berê livadinê teqez-lep</u>  | <u>Ji destnîşanker dûr ve</u>      | <u>Paş ve</u>               |
| <u>Berê livadinê teqez-tilî</u> | <u>Jor ve</u>                      | <u>Jor ve</u>               |
| <u>Berê livandinê tali</u>      | <u>Bi aliyê tiliya beranekî ve</u> | <u>Bi aliyê nava lep ve</u> |

**Şekil 90: Analîza Berê Livandinê Ya ZAK**

Johnston & Schembri (2007) di ASL da di îşareta *Dayik* (*Mother*) da berê livandinê nîşan didin: Kefa destê sereke ji destnîşanker dûr va dilive.



**Şekil 91: Di ASL Da Îşareta Dayik (Mother)**

Ji mînakên li jêr û ji agahiyên li ber dest tê famkirin, wekî di ASL da heye di ZAK da jî ji bo nîşandana îşaretan, divê mirov berê destên xwe ber bi aliyê çep, rast, jêr, jor, ber bi laş va yan jî ji laş dur va bilivîne. Ev yek nîşana sêberîbûna zimanê îşaretan e ku berê livandinê bi sê orijîna va jî dibe. Ji wêneyên li jêr wê çêtir bê famkirin (Dictionary, 2000).



**Şekil 92: Berê Îşaretan Bi Aliyê Çep û Rastê Va**

Mînak: Îşaretên *Tu* û *Ez* bi destekî tîr çêkirin. Îşaretên “alîkarî xwestin” û “alîkarî kirin” jî bi du destan tîr çêkirin. Ev herdu îşaret, ji aliyê berê livandinê va wekhev in.

Di îşareta “ez” da destê destnîşanker ber bi wî va dilive, di îşareta “tu” da berê îşaretê ji destnîşanker bi dûr va ye.



TU

EZ

**Şekil 93: Di ZAK Da Îşaretên Tu û Ez**

Di îşareta alîkirinê da, ku îşareta “*alîkariya te bikim*” bê çêkirin her du dest ji destnîşanker dûr va dilive, ku îşareta “*alîkariya min bike*” bê çêkirin, her du dest ber bi destnîşanker va dilivin.



ALÎKIRIN

**Şekil 94: Di ZAK da Îşareta Alîkarkirinê (Bi Pêş Yan Paş Va)**

Mînak: Îşaretên *Zeytûn* û *Qesp/Xurme* da şiklê dest heman şikle, lêbelê di îşareta “zeytûnê” da, dest kulmkirî ye, tiliya eşhedê dirêjkirî ye, li ser lêv e, berê livandina tiliyê bi jêr va ye.



Qesp/Xurme

**Şekil 95: Di ZAK Da Îşareta Qesp/Xurme**

Di îşareta “zeytûn”ê da berê livandina tiliyê bi jor va ye.



Zeytun


**Şekil 96: Di ZAK Da Îşareta Zeytûn**

Di îşareta *Ew* da berê livandinê ji destnîşanker dûr va ye, lê ne ber bi hember va ye, ber bi destê sereke wî aliyê va ye.



**Şekil 97: Berê Livandinê Ji Destnîşanker Dûr Va, Çeperast, Îşareta *Ew***

Di mînaka îşareta *Yeksan* da şiklê dest kulm e û tenê tiliya gustîrkê û tiliya eşedê dirêj kirî ye. Herdu tilî ber bi destê sereke va dilivin û tîn girtinê.



**Şekil 98: Berê Livandinê Bi Aliyê Destê Sereke Va, Îşareta Yeksan**

Di mînaka îşareta *Mikrofon* da berê livandinê bi jor û jêr va ye. Destê sereke kulm e û heta ber dev diçe û ber bi jêr tê.




**Şekil 99: Berê Livandinê Ber Bi Jor û Jêr Va, Îşartea Mikrofon**


Amûrên muzîkê yên bayî pir dişibine hev. Berê *Klarnetê* tam li jêr e, berê *Zirna* ji klarnetê pir hindiktir li jêr e, berê *Borazanê* jî ji zirna hindik li jêr e. Yanî berê her sê amûran li jêr e, li gorî tewandina ber bi jêr wate diguhere. Di îşareta *Klarnet* da mehd û mirûz bêîfade ne. Lê di îşareta *Zirna* da bi îşaretê ra gelpik bi hewayê tê

tijekirin. Yanî mirûzê destnîşanker jî alîkariya wateya îşaretê dike. Îşaretên *Flût* û *Trompet* li gorî yê din berê wan li pêşber e. Di îşareta *Flûtê* da serî hinek din li jor e û şiklê lêvan wekî pîfkirinê ye.







Borazan



Zirna



Klarnet



Trompet



Flût

Şekil 100: Amûrên Muzîkê Yê Bayî

### 3.2.5. Îşaretên herî piçûk yê cotepeyv (*Minimal Pair*)

Gelek îşaret hene ku tenê ji aliyê parametreyekê va cuda ne. Îşaretên Kar (Work) û Peyivîn (Talk) ji aliyê cih, livandin û berê livandinê va dişibin hev lêbelê ji aliyê şiklê dest cuda ne. Li Ser (On) û Rast (True) ji aliyê berê livandinê (orientation) cuda ne. Delal (Beautiful) û Bîr (Well) ji aliyê cih cuda ne, Bira (Brother) û Kaxez (Paper) ji aliyê livandinê cuda ne (Johnston & Schembri, 2007, s. 82). Îşaretên Cûtîn (Chew) û Şuştîn (Wash) tenê ji aliyê mirûz (facial expression) va cuda ne (Spence & Woll, 1999, s. 157).

“Di zimanê axaftinê da cotepeyvên herî piçûk, hebûn yan tinebûna perçeyên peyvên yê bêtêkilî yan jî bi taybetmendiyeke fonetîk, cudabûna peyvên e” (Kenstowicz, 1994). Li gor Spence & Woll (1999) di zimanên axaftinê da peyv, ji avaniyên fonetîk yê wekî dengdar, dengdêr û bi kirp gotin pêk tên; di zimanê îşaretan da jî, ji lihevciyêna hêmnên wekî şiklê dest, cih, livandina destekî yan du destî, berê livandina kefa dest û tiliyan û hereketên ji xeynî dest pêk tên. Yanî cotepeyvên herî piçûk ew in ku, peyvên ku pir dişibine hev, lê tenê dengê wan cuda ye. Mînak: Heval û Hewal. Di van herdu peyvên da tenê dengê cuda ye û wate jî cuda ye. Wateya Heval: Kesên ku hev dinasin. Wateya Hewal: Rewş, hal.

Di zimanekî da, ji aliyê cîyê derketina yan bilêvkirina du peyvên ku dişibine hev da, cudabûna tîpek tenê jî ku wate diguherîne, ew cotepeyvên herî piçûk (*minimal pair*) in. Di ZAK da jî, pir mînak hene ku ji çend parametreyan parametreyek tenê cuda ye û peyv/îşaret diguhere. Mînak: *Kurta* (kurt, kurte), *Dreža* (dirêj, axaftina dirêj). Herdu îşaret ji aliyê hemû parametreyan va dişibine hev, şiklê dest, cih û berê wan eynî ye, lêbelê tenê ji aliyê livandinê (*movement*) va cuda ne (Dictionary, 2000).




a) KURTA




b) DREŽA

### Şekil 101: Du Îşaretên Herî Piçûk Yên Cotepeyv

Mînaka îşaretên *Mirîşk* û *Şer* (fight) da îşaret ji aliyê şiklê dest, livandin, cih û berê livandinê va va wekhev e. Dema îşareta “şer” çêdikin tilî ji hev hinek dûr in, di îşareta “mirîşk”ê da tilî li hev dikevin.



a) ŞER



b) MİRÎŞK

### Şekil 102: Di ZAK Da Îşaretên Cotepeyv, Şer û Mirîşk

Yan jî di îşareta *Elektrîk/Kareba* da hemû parametre wekî yê *Mirîşkê* ne lê tenê hejmara tiliyan diguhere. Di îşareta “mirîşk”ê da tiliyek e, di “elektrîk”ê da 2 tilî ne.



**Şekil 103: Di ZAK Da Îşareta Elektrîk/Kareba**

#### **1.1.1. Di ZAK Da Avahiya Kîteyên Îşaretan**

Çawa ku bi saya dengdêran peyv tîn bihîstin, bi saya livandinê jî îşaret tîn nîşandan/xuyakirin. Li gorî Emmorey (2007, s. 704), di Zîyan da jî kîte hene û ASL jî yek ji wan zimana ye. Di kîteyeke îşaretekê da livandinek heye. Brentari (2012, s. 28), ji ber tîkiliya fonksiyonên livandinê îşaretan û fonksiyonên dengdêrên peyv, livandinê dendika kîteyan (*nuclei of the syllable*) qebûl dike.

Di nav parametreyên avahiya fonolojiyê da kîte jî cîyekî pir giring digirin. Mîna ASL, ZAK jî livandineke piçûk li îşaretekê zêde dike û îşareteke/peyveke nû jê çêdike. Yanî kîteyek lê zêde dike û îşareteke/peyveke nû jê çêdike. Mînak: Îşareta *Bahêz* (bihêz) bêkîte ye û AW îşareteke zêdekirî û yek kîte ye û peyvên wekî *Sîlâw* (silav) ku ji kîteyeke giran (*heavy syllables*) pêkhatî jî hene (Dictionary, 2000).



a) BAHĚZ



b) SĹÂW




c) ÂW

#### Şekil 104: Hin Kîteyên ZAK

Em dikarin ji hin îşaretên bêkîte, tenê bi kîteyek zêdekirinê îşaretên nû jî çêkin. Bo nimûne, îşareta *Kursî* bêkîte ye, nalive, dest dişibe gur. Ku em kîteyek, yanî livandineke berê tiliyan bi jor ve lê zêde bikin, wê bibe îşareta *Gur*.



a) KURSÎ



b) GUR

#### Şekil 105: Di ZAK Da Kîtekirina Kursî û Gur

Herjmara kîteyan, li gorî hejmara livandinên li dû hev tê diyarkirin. Her wekî ku Quer û yd. (2017) dibêjin, kîteya Zîyan bi giştî herî kêr ji yek şiklê dest, ji yek cih û ji livandinekê pêk tê û yekîneyeke li dû hev e. Di îşareta *Endazyarî* da du livandinên li dû hev hene, ji ber vê bi du kîte tê qebûlkin.




**Şekil 106: Di ZAK Da Kîtekirina Endazyarî**

Livandinên hêsan û livandinên giran hene. Her wekî ku Quer û yd. (2017) dibêjin, livandinên hêsan yekîneyên sivik in û ji ber vê kîte jî kîteyên hêsan in. Livandinên kompleks yekîneyên giran in û kîteyên wan kîteyên giran in. Di mînaka îşareta *Lîmon* da livandineke sivik heye, yanî tenê tiliyên dest tîr girtin, ji ber wê kîte hêsan e.



**Şekil 107: Di ZAK Da Kîtekirina Lîmon**

Di mînaka îşareta *Pîvaz* da livandineke giran çêdibe, yanî şiklê dest, cih û berê livandinê diguhere, lewra kîte, kîteyeke giran e.



**Şekil 108: Di ZAK Da Kîtekirina Pîvaz**


Yanî livandinên giran livandinên kompleks in, yanî ji du livandinên hemdem pêk tên, yan jî hêmaneke fonolojîk (şiklê dest, berê livandinê, cih) diguhere.

Movikek çiqas nêzî laşê destnîşanker be, bidengbûna wê ewqas bilind e. Bi vî awayî, movikên ku di livandina îşaretekê da tên bikaranîn, li gorî pîvangeke bidengbûnê, yanî li gorî hiyerarşîyeke bidengbûnê wê rêz bibin. Li gorî Brentari (1998), di asta kîteyê da berzbûn (*prominence*) bi giştî bi guherandina hêmanên livandinê yan jî bi guherîna dirûvê şiklê dest diyar dibe. Berzbûna livandinê, asta bidengbûna (*sonority*) kîteyê diyar dike. Yanî îşaret çiqas ji dûr ve tê têgihiştin. Bidengbûn, bi wan movikan tê pîvandin ku ew movikên ji bo livandinekê îfade bikin tên bikaranîn.

*Hiyerarşîya bidengbûnê (Sonority hierarchy):*

Sermil (*shoulder*) > enîşk (*elbow*) > zend (*wrist*) > movikên bingeîn (*base joints*) > movikên ne-bingeîn (*non-base joints*)

Bidengbûna kêr: Kal (ZAK)



Şekil 109: Bidengbûna Kêr, Îşareta Kal

Bidengbûna bilind: Sor (ZAK)




Şekil 110: Bidengbûna Bilind, Îşareta Sor

Rêza kêteyan ya ji aliyê sivikbûn û giranbûnê va jî di wateya îşaretan da diyarke e. Li gorî Quer û yd. (2017) di hemû Zîyan da kête bi qalibên “sivik+qiran, qiran+sivik, qiran+qiran” rêz dibin. Di ZAK da me qalibên sivik+qiran, giran+qiran dît. Ji bo qaliba sivik+qiran îşareta *Cîgir* mînak e. Pêşî kêteyeke sivik çêdibe, paşî şiklê dest diguhere û kêteyeke giran çêdibe.



**Şekil 111: Di ZAK Da Rêza Kîteyan Ya Sivik+Giran, Îşareta Cîgir**

Ji bo qaliba giran+giran, *Parêzer* mînak e. Îşaret ji du kîteyên giran û lidûhev pêk tê.




**Şekil 112: Di ZAK Da Rêza Kîteyan Ya Giran+Giran, Îşareta Parêzer**

Dema çêkirina kîteyê, laşê destnîşanker çiqas şidandî be kîte ewqas kirpandî ye. Mînaka îşaretên *Îro* û *Niha* ji aliyê kirpandinê ji hev cuda ne, wekî din bi temamî wekhev in. *Niha* pir şidandî tê çêkirin. Me wêneyê wan li jor daye.

### **3.2.6. Hemdemî û lidûhevî (simultaneity and sequentiality)**

Taybetiya hemdemî, îşaretan ji peyvan cuda dike. Li gorî Liddell (2003, s. 6-8) îşaret, tevahiya hemdem ya taybetiyên bidestkî û yên ne-bidestkî ye. Li gorî Spence & Woll (1999, s. 159) û Spence (2005, s. 10), çêkirina şiklê destekî ya ne li ser laş be û ne nêzî devereke laş be ne pêkan e. Ku cîyê dest û şiklê dest neguhêre jî ne pêkan e ku livandinek bînin holê. Mînak: Ji bo îşareta *Jin* (*Woman*) ya di ASL da; şiklê dest, cih, livandin, berê livandinê û taybetiyên ne-bidestkî di heman demê da tên çêkirin.



**Şekil 113: Di ASL Da Îşareta Jin (woman)**

Îşareta *Jin* di ZAK da jî du kîteye û divê li dû hev werin. Destê sereke divê pêşî li eniyê, paşî li hinarikê temas bike. Yan na îşaret bêwate dibe.



**Şekil 114: Di ZAK Da Îşareta Jin**

Peyvên axaftinê, ji kombînasyonên rêzkirî yê foneman çêdibin (Sandler & Martin, 2006, s. 120). Tiştê ku çotepeyvên herî piçûk pêk tîne, dijberiya (*contrasts*) lidûhev hatina foneman e. Di Zîyan da gelek cotepeyvên herî piçûk, wekî dijberiyên hemdem tîne pênasekirin. Mînak: *Kengî (When)* ji aliyê cih va ji *Çiqas (How Much)* cuda ye.

**Tablo 4: Dijberiyên Hemdem Yên Îşaretan**

|           | WHEN               | HOW MUCH           |
|-----------|--------------------|--------------------|
| Handshape | 5 handshape        | 5 handshape        |
| Location  | on the cheek       | on the chin        |
| Movement  | wriggling movement | wriggling movement |

Îşareta WHEN wisa tê nîşandan:



**Şekil 115: Di ASL Da Îşareta When (Kengî)**

Îşareta *Dêbav* (*Parents*) ya ASL, ji hevedudana îşaretên *Dê* (*Mother*) û *Bav* (*Father*) pêk tê.



**Şekil 116: Di ASL Da Îşareta Dêbav (Parents)**

Hin îşaret hene ku ji şiklê destek bi yê din va, ji cîyekî bi yê din va xwedî rêzeke livandinê ne. Îşareta *Bihîstin* (*Hearing*) çend heb cîyan bi kar tîne: Pêşî şiklê dest li guh temas dike û pişt ra ber bi çenê va hereket dike. Îşaretên hevedudanî, ji kombînasyonên rêzkerî yên du îşaretan pêk tên.

Di îşareta *Bihîstinê* da ku rêza îşaretan biguherînin, yanî şiklê dest ji çenê biçe guh; yan jî di îşareta *Dêbav* da pêşî bav paşî dê were, yanî rêza îşaretan biguhere wateya xwe winda dike. Hêmanên peyvan pêşî bi awayê beşan û paşî jî bi awayê kêteyan hatine avakirin (Johnston & Schembri, 2007, s. 109-110).




**Şekil 117: Di ASL DA Îşareta Bihîstin (Hearing)**

Taybetiya îşareta *Bihîstinê* (*Kerr û Lal*) di ZAK da jî heye. Lêbelê îşaret di ZAK da Ji aliyê hejmara tiliyên hîlbijartî va diguhere. Di ASL da tenê tiliya eşedê hîlbijartî ye, di ZAK da tiliya eşedê û tiliya gustîrkê hîlbijartî ye. Herweha divê devera pêşî guh, devera paşî dev be. Ku pêşî dev û paşî guh were kîtekirin wê îşaret bêwate be.



**Şekil 118: Di ZAK Da Bihîstin**

Dema lidûhevtî were paşçavkirin yan îşaret, wekî îşareta bihîstinê, bêwate dibe yan jî wate diguhere. Di mînakê îşaretên *Roj* û *Şev* da rêza îşareta ku were guhertin, wate diguhere. Lewra berê livandina herdu destan ber bi hundir va be wateya îşaretê dibe *Şev*, berê livandinê ber bi derve be wateya îşaretê dibe *Roj*. Me di beşa cih da îşareta *Şev* nîşan dabû, emê li jêr îşareta *Roj* nîşan bidin.



**Şekil 119: Di ZAK Da Îşareta Roj**

Dema îşaret tîn çêkirin, şiklê dest divê di herêma destnîşanê da xwedî cîyekî be, divê di cîyê ku cih yan berî diguhere da û di heman demê da û hemû li dû hev bin û bi carekê da pêk were. Di ZAK da jî hemdemî heye. Mînak: *Camadânî* (cemedanî), destê sereke li ser serî, bi tiliya eşedê, bi hereketa bazineyî tê çêkirin. *Sîlâw* (silav), destê sereke ji serî bi aliyê singê va tê hereketkirin.



**Şekil 120: Di ZAK Da Hemdemî û Lidûhevî**

Di ZAK da jêçêkirin/dariştineke bi rêzê heye. Mînak, rêza îşaretan ya ji şiklekî dest ber bi ya din va ango ji cîyekî ber bi yê din va ku were guhertin, wê îşaretên bêwate çêbibin ku nayên qebûlkirin. Bi tiliya eşedê peyva *Zmânawânî* (zimannasî) tê çêkirin. Tiliya eşedê dirêjî serê ziman dikin, ku mîna şiklê tîpa Ե ye, dû re tiliya eşedê û tiliya navîn bi hev ra, ber bi jêr tîn livandin û bi aliyê din va tê dirêjkirin. Lêbelê rêza livandin û cih bê guherandin, îşareteke bêwate te çêkirin (Dictionary, 2013).



Şekil 121: Di ZAK Da Lidûhevî

### 3.3. Hevoksazî (Syntax)

Dema rêzkirina peyvan hat gotin, hêmanên hevokê û rêbazên rêzkirinê tê famkirin. “Di zimanên axaftinê da ev hêman kirde (K), bireser (B) û lêker (L) in.” (Greenberg, 1963). “Ji ber ku ziman bi demê ra diguherin hin zimanên ku xwedî rêza KBL ne, bi demê ra rêza wan guheriya ye û bû ye KLB.” (Vennemann, 1976). Dryer (2005), di xebata xwe da li ser rêzimanê 1228 zimanan xebitiye û li gorî vê, ji van zimanan 497ên wan bi rêza KBL, 435ên wan bi rêza KLB, 85ên wan bi rêza LKB, 26 ên wan bi rêza LBK, 9 ên wan bi rêza BLK û 4 ên wan bi rêza BKL rêz dibin. Di 172yên wan da rêzeke diyarker nehatiye dîtin.

Xuya ye ku di vê xebatê da hevokên gerguhêz esas girtine. Lewra hemû qalib li ser lêker, kirde û bireserê hatine avakirin. Di zimanê kurdî da hem hevokên gerguhêz hem yên negerguhêz hene. Di hevokên negerguhêz da bireser tine ye, li van qaliban nayê. Heman rewş di zimanê îşaretan da jî heye. Li gor Yildirim (2012), qaliba hevokên gerguhêz Kirde + Bireser + Lêker e.

Li ser zimanên îşaretan jî lêkolînên rêzkirina hevokan tên kirin. Di Zîyan da avakirina hevokan wekî axaftina telegrfik ya zarokan e. Di Zîyan da qertafan bikar naynin, îşaretan li du hev rêz dikin. Mînak: Di ZAK da ji bo ku hevoka “Ez ji te hez dikim” nîşan bidin divê îşaretên “Ez + Tu + Hezkirin” li du hev rêz bikin.

Agahiyên di destên me da nîşan didin ku “di zimanên axaftinê da herî zêde rêza KBL û KLB hatiye dîtin, “di heman demê da di zimanên îşaretan da jî herî zêde ev rêz heye.” (Leeson & Saeed, 2012). Ji ber cudabûna modaliteya ziman, hin ziman xwedî

du rêzan in. Me di xebatên xwe da dît ku zimanê axaftinê yê kurdî bi giştî xwedî rêza KBL ye û ZAK jî bi giştî xwedî rêza KBL ye. Lêbelê di hin hevokan da rêza KLB jî tê bikaranîn. Di hevokên gerguhêz da rêza KBL (*Ez + Tu + Hezkirin*), di hevokên negerguhêz da rêza “KL+hêmanên din” (*Ez + Çûn + Dibistan*) heye. Yanî di hevokên negerguhêz da lêker hertim ne li dawîya hevokê ye, cîyê lêkerê li gorî hevokê diguhere, heman rêz di ZAK da jî heye.

Ji ber cudabûna modaliteya ziman, di navbera ZAK û zimanê axaftinê da jî cudabûn hene. Sazan Reza Moein (2021), çend mînakên dide ku ev mînak jî nîşan didin ku di navbera herdu zimanan da jî cudabûn hene. Mînak: Mindalek/zarokek hamburger xwar (zimanê axaftinê), *Hamburger + Zarok + Xwar* (ZAK). Yanî KBL di ZAK da dibe BKL, cîyê bireser û kirde diguhere. Mînakeke din: Mamoste Şîlan nexweş e (ZA), *Şîlan + Mamoste + Nexweş* (ZAK). Di vê mînakê da jî cîyê nav û hevalnavê guheriye. Di çend hevokên pirsyariyê da rêza hêmanên hevokê diguhere, lê bi piranî rêza hevokên pirsyariyê wekhev in. Mînak: “*Tu çima dilteng î?*” (ZA), “*Dilteng + Tu + Çima (îşareta pirsê)?*” (ZAK). Di vê mînakê da cîyê lêkerê guheriye. Mînak: Cilên te delalîn (ZA), *Cil + Delal + Tu* (ZAK). Di vê mînakê da di raveka “cilên te” da cîyê cînavkê guheriye, piştî pêveberê hatiye.

## ENCAM

Mafê perwerdê wekî her însanan mafê kerr û lalan e jî. Kerr û lal jî dixwazin bibin perçeyekî civakê û ji aliyê civakê va bên qebûlkin. Me dît ku li kû derê civaka kerr û lalan hebe li wê derê zimanê îşaretan bi awayeke xwezayî diafire. Li nav her neteweyan herî kêr zimanekî îşaretan tê dîtin û bi wî zimanî perwerde dibin. Heta niha me digot zimanê kerr û lalên her neteweyê heye, ka zimanê îşaretan yê kurdan/kurdî jî heye gelo? Me dît ku zimanê îşaretan yê kurdî jî heye û xwedî 3 zaravayan e jî. Lewra kerr û lalên neteweyên din bi zimanê xwe perwerde dibin, çima yên me jî bi zimanê xwe perwerde nebin. Me dît ku li HKÎ 45 sal e kerr û lalên kurd perwerde dibin û encamên pir erênî bi dest xistine. Dibe ku di siberojê da, ji bo perwerdeya kerr û lalên kurd yên li dewletên din, ZAK bê bikaranîn û ji tecrûbeyên enstîtûyên Hîwayê sud wergerin. Lewra niha li HKÎ, dibistan û bernameyên perwerdeyê hene.

Di vê xebatê da hate dîtin ku ji aliyê xebatên zimannasiyê va seha vala maye. Xebatên yên li ser rêziman in hene jî 3 gotar in. Ji xeynî van jî 14 gotar hene ku li ser danasîna ZAK yê platforma dijîtal in û piraniya wan ji aliyê endazyaran va hatine çêkirin, yanî ne li ser rêziman in. Heta niha zimannasên kurdolojiyê bala xwe nedane zimanê îşaretan. Lewra zimanê axaftinê li ber xetereya windabûnê, tinebûnê, jibîrkirinê ye. Armanca me ew bû ku em rê vekin, rêzimanê ZAK pênasê bikin û xebatên akademiya êdî li ser vê qadê jî çêbin.

Di vê xebatê da di beşa yekemîn da me agahiyan li ser zimanê îşaretan da û bi taybetî em li ser zimanê îşaretan yê kurdî sekinîn. Ji bo baş bê famkirin me bi taybetî berawirdkirina ZAK bi ASL ra kir. Ji ber ku ZAK û ASL ji aliyê fonoloji, morfoloji û hevoksaiyê va nêzî hev in, bi piranî me ji agahî û xebatên li ser ASL sud wergirt.

Di beşa duyemîn da me dît ku li HKÎ, li sê bajaran, dibistanek bi navê Hîwayê, ji sala 1980 heya îro perwerde dide zarokên kurd yên kerr û lal. Di pêvajoyê da hin zehmet û astengiyan kişandine, lê heya îro mafê kerr û lalan yê perwerdehiyê parastine. Xebatên ku dikin jî di serî da ji bêencamî û bêderfetiya pir zor bûne, giştî bi dilsoziya mamosteyan û xêrxwazan dewam kiriye. Dîsa di beşa duyemîn da hat dîtin ku ZAK

xwedî sê zarava ye, lêbelê li ser vê mijarê tu xebat tineye. Diyar e ku civaka kerr û lalan ya HKÎ pir çalak in. Bi taybetî van salên dawî pirtir tevlî civakê bûne, mafên xwe li her qadê tînin ziman. Bi sazî, zanîngeh, TV, aktîvîst û hwd ra têkiliyên xurt pêk anîne ku bi saya van li her qadê xwe nîşan didin û maf û daxwazên xwe tînin ziman. Xwe nîşan didin û peyama didin ku em jî bi qasî mirovên normal, di jiyana rojane da bikêrhatî ne û serkeftî ne.

Di beşa rêziman da, di binbeşa morfolojiyê da me diyar kir ku ZAK û ASL ji aliyê morfolojiyê va pir dişibine hev. Me ji berawirdkirina herdu zimanan dît ku qaîdeyên morfolojiya ASL bi giştî ji bo ZAK jî derbasdar in. Me ji bo her qaîdeyan bi mînakên delîlan nîşan da. Di binbeşa morfolojiyê da me morfemên girêdayî yên dariştinê, morfemên girêdayî yên kêşanê, morfemên xweser yên ferhengî tespît kir, lêbelê morfemên xweser yên rêzimanî tespît nekir. Me dît ku dubarekirin jî hêmaneke giring yê morfolojiyê ye ku wateya îşaretan diguherîne. Beşa morfolojiyê ji bo pênasêkirinê têrker e.

Di binbeşa fonolojiyê da hemû hêmanên fonolojiya ASL di ZAK da me tesbît kir. Me dît ku ZAK û ASL ji aliyê fonolojiyê va pir dişibine hev. Me ji bo şiklê dest, livandin, cih û berê livandinê di ZAK da ji bo her cureyê van hêmanan, bi hûrgilî, li ser mînakên delîlan nîşan da. Hema hema ji her aliyê va me mînakên nîşan da. Ji bo hêmanê fonolojiyê yê taybetiyên ji xeynî destkî, ji aliyê mehd û mirûz va mînakên da, lê hejmar kêmtir bû. Ji bo livandinê laş me pir kêmtir mînakên da. Diyar e ku “şiklê dest, livandin, cih, berê livaandinê û taybetiyên ji xeynî destkî” ji aliyê çekirina îşaretan va giring in û hêmanên diyarker in. Lewra yek tenî jî cuda be wate diguhere. Ji xeynî van, beşa fonolojiyê ji bo pênasêkirinê têr û tije ye.

Di beşa hevoksaziyê da me pir mînakên neda. Lewra li ber destên me agahî pir kêmtir bûn. Mînakên ku me daye jî tenê bi nivîskî ne, me wêneyan neda. Vîdyoarşîvên li ber destên me jî pir derfet neda ku em vê beşê berfirehtir vebêjin. Beşa hevoksaziyê ji bo pênasêkirinê hinek serkê mabe jî wê têrê bike. Me di vê beşê da dît ku ZA û ZÎ ji aliyê sazkirina hevokan va ji hev cuda ne, yanî baweriya “ZÎ qaîdeyên rêziman ji ZA girtine.” çewt e. Yan jî fikra “ZÎ varyantên ZA ne û ji ber wan hatine çekirin.” Jî çewt e. Lewra ZÎ di nav civaka kerr û lal da bi awayekî xwezayî û ji ber xwe va çêbûne û ji aliyê hevoksaziyê va ji hev cuda ne.

Di vê xebatê da em nabêjin ku gotina dawî ev e, îdîayake me yê wisa tine ye. Dibe ku siberojê da, ji bo xebatên nû bibe pêşeng. Weke destpêkê jî dikarin bibînin. Lewra me ji nû ve qaîdeyên rêziman nivîsiye. Agahiyên ku me daye, me ji pîşporên ZAK pirsîye û me bi wan daye tesdîqkirin. Lê dîsa jî dibe ku kêmasî û çewtiyên me hebin.



## ÇAVKANÎ

- Abdel-Fattah, Mahmud. *Arabic sign language: A perspective*. Journal of Deaf Studies and Deaf Education. (2005). 10(2), 212–221.
- Al-Fityani, Kinda - Carol Padden. *Sign languages in the arab world*. In Diane Brentari (ed.), *Sign Languages*. (New York: Cambridge University Press, 2010). 433–450.
- Al-Fityani, Kinda. *Arab sign languages: A lexical comparison*. (Center for Research in Language Technical Reports 19(1), 3–13. (2007). <http://crl.ucsd.edu/newsletter/25-1/articles.php> (Accessed 15 March 2014).
- Amazha app <https://apps.apple.com/us/app/amazha/id6450062979>
- Anadolu Ajansi (05.09.2024) <https://www.aa.com.tr/tr/yasam/irakli-din-adami-isitme-engelliler-icin-isaret-diliyle-kuran-i-kerim-hazirladi/3321843#:~:text=Erbil'de%20ya%C5%9Fayan%20din%20adam%C4%B1,%C4%B1%20Kerim'in%20yayg%C4%B1nla%C5%9Ft%C4%B1r%C4%B1mas%C4%B1n%C4%B1%20arzuluyor>
- Bellugi, U. û yd.. “*Language, modality, and the brain*.” Trends in Neurosciences (1989) Hejmar: 10.
- Bellugi, U., & Klima, E. “*Sign language*”: International Encyclopedia of the Social and Behavioral Sciences (2001). Hejmar: 21. Oxford:UK
- Benes, F. & Paré-Blagoev, J. “*Brain bases of reading disabilities*”: Mind, Brain and Education in Reading Disorders. Cambridge University Press: New York. (2007).
- Bloomfield, L. *Language*. New York: Holt, Rinehart & Winston. (1933).
- Brentari, (2005). Representing handshapes in sign languages using morphological templates. H. Leuninger & D. Happ (Der.) içinde, *Gebärdensprachen:struktur, erwerb, verwendung* (Linguistische Berichte Special Issue 15) (ss. 145-178). Hamburg: Buske.
- Brentari, D. (1998). A prosodic model of sign language phonology. Cambridge, MA: MIT press.
- Brentari, D., & Eccarius, P. (2010). Handshape contrasts in sign language phonology. D. Brentari (Der.) içinde, *Sign languages* (ss. 284-311). Cambridge: Cambridge University Press.
- Brentari, Diane (2012). ‘Phonology’. In *Sign Language: An international Handbook* edited by Pfau, Roland; Steinbach, Markus and Woll, Bencie. Berlin: De Gruyter Mouton, pp.21-55.
- Crasborn, Onno, “Phonetics”. In *Sign Language: An international Handbook* edited by Pfau, Roland; Steinbach, Markus and Woll, Bencie. Berlin: De Gruyter Mouton, pp.4-20, 2012.

- Dictionary of the Signs for the Deaf. by the Independent Human Rights Commission. (2000)
- Dictionary of the Signs for the Deaf. by the Independent Human Rights Commission (Mathematics). (2013)
- Dryer, M. S. *Order of subject, object, and verb*. M. Haspelmath, M. S. Dryer, D. Gil, & B. Comrie (Der.) içinde, The world atlas of language structures. Oxford: Oxford University Press. (2005).
- Emmorey, K. (2002). Language, cognition, and brain: Insights from sign language research. Mahwah, NJ: Lawrence Erlbaum.
- Emmorey, K. ü yd. “*The neural correlates of sign versus word production.*”: Neuroimage. (2007). Hejmar: 36.
- Fant, Lou and Fant, Barbara Bernstein. *American Sign Language Phrase Book* (Third Edition) USA. (2008). ss. 10-75.
- Goldin-Meadow, S. *What language creation in the language modal ity tells us about the foundations of language*. The Linguistic Review. (2005). 22, 199-225.
- Greenberg, J. H. *Some universals of grammar with particular reference to the order of meaningful elements*. J. H. Greenberg (Der.) içinde, Universals of grammar. Cambridge, MA: MIT Press. (1963). ss. 73-113.
- Halim, Subhi & Russel, Alexander. *Ferhengi Kerulaian [deaf-mute dictionary]*. Kurdistan: UNICEF. (2002).
- Hendriks, Hermina Berindina. *Jordanian sign language: Aspects of grammar from a crosslinguistic perspective*. Utrecht: LOT: University of Amsterdam dissertation.(2008).  
<http://www.lotpublications.nl/publish/articles/003014/bookpart.pdf> (Accessed 26 February 2014).
- Hickok, G. & Bellugi, U. “*Neural organization of language, clues from sign language aphasia.*”: The Handbook of Psycholinguistic & Cognitive Processes, Perspectives in Communication Disorders. Taylor & Francis. (2010)
- Human rights Watch/Middle East. Iraq’s crime of genocide: The Anfal campaign against the Kurds. New Haven: Yale University Press. (1995)
- International Organization for Migration (IOM) ;“*DEAF PEOPLE IN IRAQ, A CULTURAL-LINGUISTIC MINORITY: THEIR RIGHTS AND VISION FOR INCLUSION*”. (2024)
- Jaza, Zana. Kurdish Sign Language. In Jepsen, de Clerck, Lutalo-Kiingi & McGregor (eds.), *Sign Languages of the World: A Comparative Handbook*. (2015). 567–582. De Gruyter Mouton.
- Johnston, Trevor & Adam Schembri. [2007]. *Australian sign language: An introduction to sign language linguistics*. Cambridge: Cambridge University Press. (2010)

- Johnston, Trevor & Schembri, Adam. *Australian Sign Language: An introduction to Sign Language Linguistics*. Cambridge: Cambridge University Press. (2007)
- Karnopp, Lodenir Becker (2002). "Phonology Acquisition in Brazilian Sign Language". In *Directions in Sign Language Acquisition* edited by Morgan, Gary and Woll, Bencie. Amsterdam: John Benjamins B.V., pp.29-53.
- Kenstowicz, M. (1994). *Phonology in generative grammar*. Cambridge, MA: Blackwell.
- Leeson, L. & Saeed, J. I. Word order. R. Pfau, M. Steinbach, & B. Woll (Der.) içinde, *Sign language: An international handbook*. (Berlin: Mouton de Gruyter. 2012). ss. 245-264.
- Liddell, Scott, K. (2003). *Grammar, Gesture and Meaning in American Sign Language*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Macsweeney û yd.. "Dissociating Linguistic and Nonlinguistic Gestural Communication in the Brain.": *Neuroimage*. (2004). Hej: 22.
- Macsweeney û yd.. "The Signing Brain, The Neurobiology of Sign Brain.": *Trends in Cognitive Sciences*. (2008). Hej: 12.
- Meir, Irit and Sandler, Wendy (2008). *A Language in Space: The Story of Israeli Sign Language*. London: Lawrence Erlbaum Associates, Traylor and Francis Group.
- Miles, Mike. *Signing in the seraglio: Mutes, dwarfs and jestures at the Ottoman court. 1500–1700*. *Disability & Society* . (2000) 15(1), 115–134.
- Moein, Sazan Reza. *جۆره کانی رسته له زمانى ئاماره دا* . *Journal of the University of Garmian*. (2021) 8 (3). <https://doi.org/10.24271/jgu.2021.140990>
- Moen, Sazan Radha (2015). *The Sign Language in Kurdish Linguistics: Deaf Language as an example*. Unpublished Dissertation
- N. F. Dronkers, O. Plaisant, M. T. Iba-Zizen, and E. A. Cabanis. "Paul Broca's Historic Cases: High Resolution MR Imaging of the Brains of Leborgne and Lelong". *Brain*. (2007). 130 (Pt 5). s. 1432–1441.
- Neville, H. û yd.. "Cerebral Organization for Language in Deaf and Hearing Subjects, Biological Constraints and Effects of Experience."(: *Proceedings of the National Academy of Sciences of the USA*. 1998). Hej: 95.
- Pa, J. û yd.. "Neural organization of linguistic short-term memory is sensory modality-dependent, evidence from signed and spoken language."(: *Journal of Cognitive Neuroscience*. 2008). Hej: 20.
- Pallier, C. "Critical periods in language acquisition and language attrition, language attrition."(: *Theoretical Perspectives*. John Benjamins: Amsterdam. 2007).
- Pika, Simone & Mitani, John. "Referential gestural communication in wild chimpanzees (*Pan troglodytes*)". (Mart 2006)
- Pinker, Steven. *The language instinct, the new science of language and mind*, penguin books (London, UK 1994).

- Pirot, Khunaw Sulaiman & Ali, Wiryia Izzaddin. *The Phonological Structure of American Sign Language -ASL and zmânî âmâžai kurdî – ZAK*. (Journal of University of Raparin. September, 2022). 155-187. [https://DOI:10.26750/Vol\(9\).No\(4\).Paper8](https://DOI:10.26750/Vol(9).No(4).Paper8).
- Quer, Josep û yd. *SignGram Blueprint - With the collaboration of Brendan Costello and Rannveig Sverrisdóttir -A Guide to Sign Language Grammar Writing*, Germany, Walter de Gruyter, 2017.
- Rambhau, Pingale Prerna (2013). "Recognition of Two Hand Gestures of Word in British Sign Language". In *International Journal of Scientific and Research Publications*, Volume 3, Issue 10, October 2013, pp.1-5.
- Rûdaw 2025 <https://www.rudaw.net/turkish/kurdistan/24022025>
- Sandler, W. & Lillo-Martin, D. *Sign Language and Linguistic Universals*. (Cambridge University Press. 2006).
- Spencer, Amy; Glover, Cathy. "A Continuum of Communication: Manually Coded English Systems". Maine Educational Center for the Deaf and Hard of Hearing. (2015-06-15)
- Sutton-Spence, Rachel & Bencie, Woll. *The Linguistics of British Sign Language: An Introduction*. (Cambridge: Cambridge University Press. 1999)
- Takkinen, Ritva (2008). "Some observations on the use of HamNoSys (Hamburg Notation System for Sign Languages) in the context of the phonetic transcription of children's signing". In *Sign Language Acquisition* edited by Baker, Anne and Woll, Bencie. Amsterdam: John Benjamins B.V., pp. 87-105.
- Taub, Sarah, F. (2004). *Language from the Body: Iconicity and Metaphor in American Sign Language*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Taylor-Dileva, Kim. *Once upon a sign : using American Sign Language to engage, entertain, and teach all children*. (2011).
- Tennant, Richard, A. and Brown, Marianne Gluszak (1998). *The American Sign Language Handshape Dictionary*. Washington, DC: Gallaudet University Press.
- The American University of Kurdistan (2023-08-30) <https://auk.edu.krd/introducing-the-inaugural-course-on-kurdish-sign-language-interpreting-at-auk/#:~:text=To%20apply%2C%20please%20click%20here>
- Vennemann, T. *Categorial grammar and the order of meaningful elements*. A. Juilland (Der.) içinde, *Linguistic studies offered to Joseph Greenberg on the occasion of his sixtieth birthday*. (Saratoga, CA: Anma Libri. 1976). ss. 615-634
- Wallman, Joel. *Aping language*. (Cambridge: Cambridge University Press. 1992).
- WFD. The legal recognition of national sign languages. (2025, May 13). [https://wfdeaf.org/the-legal-recognition-of-national-sign-languages/?\\_country\\_map=7.551920195083047%2C-91.77796194767512%2C18.47326917018111%2C-71.82679007267512%2C6](https://wfdeaf.org/the-legal-recognition-of-national-sign-languages/?_country_map=7.551920195083047%2C-91.77796194767512%2C18.47326917018111%2C-71.82679007267512%2C6)

- Wheatley, Mark. *Sign language legislation in the European Union*. Pabsch, Annika., *European Union of the Deaf*. (Brüksel: European Union of the Deaf. 2010)
- Wilcox, Sherman. “*Signed Languages*”. In *The Oxford Handbook of Cognitive Linguistics* edited by Geeraerts, Dirk and Cuyckens, Hubert. (New York: Oxford University Press. 2007). pp.1113-1136.
- Yıldırım, Kadri. *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi)*. (Mardin, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, 2012).
- Yıldız, Kerim. *The Kurds in Iraq: The past, present and future*. (London: Pluto. 2004)
- YouTube 2023  
[https://www.youtube.com/watch?v=nYg0uqdRJkc&ab\\_channel=RudawMediaNetwork](https://www.youtube.com/watch?v=nYg0uqdRJkc&ab_channel=RudawMediaNetwork)

## ÖZGEÇMİŞ

|                                             |                                                                                                                                                                    |
|---------------------------------------------|--------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------|
| <b>Adı Soyadı</b>                           | Feyzullah ADIBELLİ                                                                                                                                                 |
| <b>Yabancı Dili</b>                         |                                                                                                                                                                    |
| <b>Orcid Numarası</b>                       | 0000-0003-1792-2821                                                                                                                                                |
| <b>Ulusal Tez Merkezi Referans Numarası</b> |                                                                                                                                                                    |
| <b>Lise</b>                                 | Batman Lisesi                                                                                                                                                      |
| <b>Lisans</b>                               | Dicle Üniversitesi – Çağdaş Türk Lehçeleri ve Edebiyatları                                                                                                         |
| <b>Yüksek Lisans</b>                        | Selçuk Üniversitesi – Türk Dili ve Edebiyatı Öğretmenliği Tezsiz Yüksek Lisansı                                                                                    |
| <b>Mesleki Deneyim</b>                      | 2011’den beri MEB’de Türk Dili ve Edebiyatı öğretmeni.                                                                                                             |
| <b>Akademik Çalışmalar</b>                  | 1. Adıbelli, F. 2025. ZİMANÊ ÎŞARETAN yê KURDÎ KuSL (KURDISH SIGN LANGUAGE). Uluslararası Dilbilimi ve Karşılaştırmalı Edebiyat Kongresi II., 15-16 Mayıs. Mardin. |